

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

Bihara 2000an

**STÊRKEKA
TOREVANIYÊ
JI EZMAN ŞEMITÎ**
Bayram Ayaz

**Prof. Dr. WOLF
DIETER HÛTTEROTH**
ile bir sۆyleşî

**QONAXÊN KOÇERİYA
MALBATEKÊ**
Nuh Ates

GOTINÊN MEZINAN
Temelî Bayrak

**İÇ ANADOLU'YA GÖÇÜN
NEDEN VE NASILI**
Bekir Darı

XELİKAN AŞİRETİ
Yakup Şimşek

PIRSA ZİMAN
Musa Anter

Aksaray Dimilicesi
Memê Hilkeçiki



10

bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve/Ûç ayda bir çikar

Utges av Apec-Förlag AB

Ans. utgivare: Ali Çiftçi

Redakslyon:

Ali Çiftçi, Bekir Dan, Dr. Mikailî, Hacı
Erdoğan, M. Bayrak, M. Duran, Muzaffer
Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress / Navnişan:

Box: 3318, SE 163 03 Spånga / Sverige
Telefon: 0046-(0)8-761 81 18
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90
E-Mail: apec@swipnet.se

Navnişana li Almanyayê:

M. Özgür / Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 KÖLN / Almanyayê
Telefaks: 0049-(0)2203-301630

Biha/Fiyatı:

Europa: 10 DM Türkiye: 1 milyon TL

Abone (2 yıllık bedeli):

İsveç: 400 SEK • Almanyayê: 80 DM

Türkiye banka hesap numarası:
F. Yıldız Vakıf Bank Polatlı Şubesi
Hesap No: 00158001 445398272.

İsveç hesap numarası:

(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanyayê hesap numarası: M. Özgür
Stichwort "Bîrnebûn" Deutsche Bank-Köln
Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

Belavkirin / Dağıtım:

Türkiye

Toplum Kitabevi / Remzi İnanç
Bayındır sok. 22/1, 0642 Yenimahalle / Ankara
Tel: 0312/434 25 43

Medya Kitabevi / Selahattin Bulut
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasajı No: 258/6
Beyoğlu-İstanbul

Gül Kitabevi

Lise cad. Zafer çarşısı No 23/a / Kırşehir

Hollanda

Neçirvan Qilori
Postbus 419
3300 AK Dordrecht / Nederland
Tel: 0031-62 46 63 655
Gironummer: 739 81 58

Danmark:

Dansk-Kurdiska Kulturhuset
Nansensgade 32 ST
TN 1366 Kopenhag K, Danmark

Çap / Baskı: Apec-Tryck & Förlag AB

ISSN 1402-7488

Her nivîskar berpirsiyarê nivîsa xwe ye.
Matê redaksiyonê heye ku nivîsên ji
Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike.
Nivîsarên ku ji Bîrnebûnê re tên, ger çap
nebin ji li xwedî nayên vegeandin.

Wêneya bergê, xaliyek ji hêla Entebê ye.

Ji sala 1880î hatîye çekirin,
mezîniya xelî (196 x 137 cm) ye.
Wêne ji kitêba *Kurdish Rugs* ya
William Egleton hatîye girtin.



Naverok/ Îçindekiler

- 3 **JÎ BÎRNEBÛNÊ**
Ali Çiftçi
- 4 **NAMEYÊN JI XWENDEVANAN**
- 7 **ZIMANÊ DAYİKÊ GIRİNG EI**
Mamostcyên kurd li Almanyayê
- 8 **Prof. Dr. WOLF-DIETER HÜTTEROTH İLE SÖYLEŞİ**
Raporaj: N. A.
- 11 **QONAXÊN KOÇERİYA MALBATEKÊ**
Raporaj: N. A.
- 13 **MİYA STEWR Û ŞIVAN**
Nuh Ateş
- 18 **ÇİĞDELİ**
Fahri Xwendevan
- 20 **CELİKÂN'DA KIYAMET**
Muzaffer Özgür
- 24 **XELİKÂN AŞİRETİ**
Yakup Şimşek
- 29 **STÊRKEKA TOREVANİYÊ JI EZMAN ŞEMİTİ**
Bayram Ayaz
- 32 **ORTA ANADOLU BOZKIRINDA BİR SEYİT**
Şükri Cülmüş
- 34 **LAWKÎ NİSKA**
İrfan Baysal
- 35 **KEÇEL**
M. Şirin Dağ
- 37 **YAKIN TARİHİMİZİ YAZACAK OLANLARA BİR DİPNOTI**
Vahit Duran
- 39 **İÇ ANADOLU'YA GÖÇÜN NEDEN VE NASILI**
Bekir Dan
- 42 **DU LİSTİKÊN XORTAN**
Berhevkar: Dr. Mikailî
- 43 **PIRSA ZIMAN**
Musa Anter
- 48 **"NE İŞA SWÊDİ YE Û NE JI MUHAMED KURD E"**
Şeyidxan Anter
- 52 **MÛRAD**
Heci Erdoğan
- 56 **KURTEJİYANA MIN**
Bekir Dan
- 62 **ÇARİN JI HÊLÊ SARİZ Ê**
M. Bayrak
- 66 **ŞİR**
İlêlin Corki, İlayrettin Güven, Neçirvan Qilori
- 73 **GOTİNÊN MEZINAN**
Temelî Bayrak
- 75 **AKSARAY DİMİLİCESİ (Dımılîce-Türkçe sözlük)**
Memê Hilkecikî

Ji Bîrnebûnê

Di pêşketina kovarekê de pir faktor hene. Ji van faktorana hinek ên bingehîn in, wek aborî, naverok û xwendevan. Xwendevan, bi ya min, yên herî girîng in. Bi rastî, ez bi rihetî dikarim li ser navê hemû hevalên redaksiyonê bibêjim ku ger ew nameyên xwendevanên Bîrnebûnê nebûna dibe ku îro em ewqas bi pêş neketana. Berî her tiştî, em li vir ji wan xwendevanên ku me nikaribûye nameyên wan di quncika *nameyên xwendevanan* de belav kin lêborînê dixwazin, ji ber ku pir name tên, gelek ji wan hem ji bo me rexneyên pozîtîf û carna jî gelek kêmasiyên me bi zîmanekî erênî tînin zimên. Ew name jî bo me dibin pîvanek ku bi rastî kovar bi balkêşî tê xwendin. Ew hemû name, çî yên pesinandinê û çî jî yên rexneyan bin, dê me pêsta bibin. Em li benda piştgiri û nameyên we ne.

Xwendevanên birêz, di hejmara 9an de nivîsên ku hatibûn weşandin, ji derveyî çend nameyên bi zîmanê tîrkî, tenê du nivîs bi tîrkî hebûn. Ew jî bo me serkeftinek e. Name û rexneyên ku piştî hejmara 9an heta niha hatine, piraniya wan jî bo vê yekê dişça ne. Ev dişahiya we, me jî kêfxweş dîke. Piraniya nameyên we bi zîmanê tîrkî ne. Erê, jî bo we elbet bi tîrkî nivisandin hêsantir e, lê bawer bikin, dema hûn carekê dest pê bikin, bi kurdî binivîsin hûn dê hîn baştir jê zewqê werbigirin û hem jî hûnê dilê me şa bikin.

Li vir, bi taybetî ji xwendevanên me yên li derveyî welêt dimînin, daxweziyek ji Bîrnebûnê heye; niha dema îzîna ye û piraniya we diçin welêt, ger hûn bikaribin, herkes jî gund û bajarê xwe bi insanên xwe yên mezin re roportaj li ser hatina wan ya Anatoliya Navîn; kengê, jî kuderê û jî bo çî hatine? Berî salên 60î çî îş dikirin û hwd, bi kurdî û dengê wan divê bi teyîp yan jî hebûn bi video bînin girtin. Ger hebûn, wêneyên kevn, name û belge jî bo Bîrnebûnê berhevkin û li ser navnişana me bişeynin. Dîrok, huner û çanda mîletkî, jî wî mîletî baştirin kes nikare berhevke û binivîsîne. Qedera mîletê me di destê mîletê me de nîne, jî ber ku kalûpîrên me, bi xwe

dîroka xwe nenivisandine, îro piraniyên me di der heqê dîrok û kultura xwe de, pir kêmtir dizanin. Ji bo ku sibê zarokên me jî, jî bo vê yekê gili û gazinan nekin û ya herî muhîm jî, bî dîrok û kultura xwe mezin nebin, divê em bi xwe hinek tiştan berhevkin, belavkin û binivîsin.

Mamostê edebiyatê SEYIT ALP jî ji nav me barkir û çû ser heqîya xwe. **SEYIT ALP** hê 55 salî bû, bi xwe kurdî jî Kirşehir/Kanlıkışlê bû. Wek mamostê edebiyatê li Kirşehir Öğretmen Okulu yê mamostetî dikir. SEYIT ALP bi romanên xwe yên bi navê *Welat - iskancanın türküsü*, *Şavk* û *Dino ile Ceren* di salên 1980î de li hemû Tirkîyê û bi taybetî jî li bajarên Kurdistanê pir dihat naskirin. Di sala 1981ê de xelata romanê ya YAZKO dabûnê. Romanên wî hemû li ser trajediya kurda ne. SEYIT ALP van salên dawî destpêkiribû bi kurdî jî dinivîsand. Em li vir jî malbata wî re dibînin serê we sax be. Du şagirtên SEYIT ALP, Bayram Ayaz û Şükrü Gülmüş di wê hejmarê de jî bo biranîna SEYIT ALP du nivîsên cûda nivîsîne, şagirtê ku mamostê xwe baş naskirine û bi awayeke xweş mamostê xwe bibîranîne.

Nuh Ateş li ser navê Bîrnebûnê bi Prof. Dr. Wolf-Dieter Hütteroth re roportajek kirîye. Hütteroth bi xwe profesorê cografîyê ye. Wek kurdnas têt naskirin. Salên 1960î de jî bo lêkolînekê çûye Anatoliya Navîn û li hinek gundên kurdan geriyaye. Di sala 1996an de li Parîsê di semînera bi navê "*Kurdên Bajari*" de li ser bajarên di sedsala 16an de ku li nav Eyaleta Diyarbekirê de bûne, semînerê daye. Disa roportajek bi navê *Qonaxên koçeriya malbatekê* bi Qasimê Heci Memed re hatiye kirin.

Disa di wê hejmarê da N. Ateş, Dr. Mikailî, M. Özgür, H. Erdoğan, V. Duran, M. Bayrak, Fahri Xwendevan, Yakup Şimşek, İ. Baysal, M. Ş. Dağ, B. Darı, Musa Anter, Hêlîn Gorkî, Hayrettin Güven, Seyidhan Anter, Temelî Bayrak, Nêçirvan Qilorî û Memê Hilkeçikî jî folklor û çanda kurdên Anatoliya Navîn nivîsên balkêş nivisandinê. Bi hêviya ku li gorî dilê we be û bihara ve jî bi xweşî û dişahî derbas be, bîmînin di xweşiyê de.

Ali Çiftçi

Nameyên ji xwendevanan/Okuyucu mektuplari



RINDEKE BIJARTÎ JI HÊLA ME!

ZAHIDE BAYRAM Sala 1999an rinda Danemerqa hate hilibijartin. Wê, di leca hilibijartina rinda Milenumê de li Finlandiyayê Danemerqa temsil kiribû. ZAHIDE BAYRAM hemwelatîya Danemerqa ye, lê bi eslê xwe Kurd e. Dê û bavê wê Kurmanc in û ji gundê Omera ne (Kulu-Konya).

Ez bi xwe jî Kurmancê hêla Kon-yayê me. ZAHIDE BAYRAM pîroz dikim û tewê, rindiya wê qe kê m newe, herçû zêde biwe.

Hesenê Mamî Alê

Merhaba,

derginizle yeni tanıştık. Başarılı bir çalışma. Köyümüzle ilgili yazıyı okuduk ve beğendik. Çalışmalarınızın devamını dileriz. Bizlerden herhangi bir isteğiniz olursa memnuniyetle yerine getiririz. Tüm birnebun çalışanlarına ve okuyucularına selamlar...

Şuayıph Köyü Derneği adına *H. Yayla*

Sevgili Bîrnebûncular!

Açık söylemek gerekirse bizleri şaşırtıyorsunuz. İlk sayımız çıktığında bunlarda bir çok Kürt gibi pes ederler diye düşünmüştük. Fakat, yolunuzda üstelik içeriğinizi zenginleştirerek yürüyorsunuz. Kutlamak amacı ile bu mektubu sizlere yazıyorum. Birde unutmadan yazayım, her sayınızda ilgi ile okuduğumuz "Yörelerimizi Tanıyalım" köşesi 9. Sayınızda yoktu. Lütfen biraz daha itina gösterin. Bütün yörelerimiz tanıtılmadı daha.

Süleyman / Almanya

Değerli Bîrnebûn çalışanları,

Sizleri ve 9. Sayıya yazıları ile katkı sunan vede emeği geçen tüm arkadaşları kutlamak istiyorum. Hikaye deneme türü yazıların Kürtçe yazılması inanıklı beni çok mutlu etti. İnanılmaz derecede haz aldım. Özellikle Nuh Ateş'in "Nivro Hepis bo Hemo" hikayedenemesi abartmış olmayayım bir Kürt klasığı derecesindeydi.

Hikayedeki kurgu, anlatımdaki sadelik ve nefid bölge Kürtçesi ile yazması dikkate değerdi. Diğer yanda, M. Şirin Dağ'ın "Lawê Hespê"; Dr. Mikailî'nin "xewna welatê Berê" başlıklı yazıları ise Orta Anadolu Kürt Edebiyatının oluşmasına katkıları olacak değerli yapıtlar olarak değerlendiriyorum. Yusuf Yeşilöz'ün yazısını bu arada unutmamak gerekir. Haydi gayret bizler farkında olmasakda Edebiyatımızın köşe taşları diziliyor.

Elif Kaplan / Ankara

Roj baş, Hevalno!

Em Kurdên Kuluyê, ji eşira Celiki nin,
Em bi ketina we ya Internetê pir şa
bûn. Silav li we giştikan ra.

Hasan û Ecevit Yıldırım / Haiger

Slavên Germ!

Ez gellek dilxweş û baxtiyar im, ku Kurdên Anatoliyê Navîn ji kovareka weki Bîrnebûn da hesreta xwe yî bi sed sala ji dûrbûyina welatê xwe Kurdistanê tînin zimên. Ez ji Kurdê Anatoliye Navîn im. Çi ji destê min were ezê bikim. Spas û serkeftin!

Almanya / Dilowan Xelikan

Hevalên Heja!

Bi rastî hûn bi wî avayî xebatekî pir girîng û bi rûmet dikin. Îro em dizanin ku li Anatoliyê, ango li dora Konya, Kirşehir, Ankara, Çorum, Çankiri û her wek din dor du mîlyon Kurd henê. Ew Kurdên bi şeref û bi rûmet, dîroka xwe, çandîya xwe, orf û adetên xwe jîbîr nekirinê û ez dikarim bê gûman bêjim, ku ewan ji Kurdên li Kurdistanê pirtir xwedî xwe û zaro-kên xwe derketine. Bi vî karê hûn bê guman dikarin bi serkewin.

Ez Kurdê Anatoliya Navîn nînim, lêbelê dilê min bi we ra yê.

Serkeftin û serfirazî

Namîl Elmanya

"Hûn ronîya tarîxa me ne."

Hezar silav ji we ra!

Sayin Bîrnebûn çalışanları, ben Ankara'nın Gölbaşı ilçesine bağlı Karagedik kasabasından bir gencim. Yayınlarımızın hepsi elimde. Hepsini büyük bir zevk ve gururla okuyorum. Yaptığınız bu büyük ve tarihi çalışmadan dolayı hepimizi kutluyor ve devamı için başarılar diliyorum.

Affınıza sığınarak birkaç eleştiri yapmak istiyorum. Yayınlarınızda Karagedik Kasabası gibi mazisi uzun olan bir yerleşim biriminden bir veya iki yerde çok kısa bir şekilde söz ediliyor. Aynı şekilde Gölbaşı'na bağlı ikinci Kürt köyüde Tepeköy'dür. Bu köy Bılıkan aşiretindedir. Maalesef Bu köyde Kürtçeyi 60 yaşın üzerindeki yaşlılar konuşabiliyor. Ünlü komedyen GAFUR KARA bu köydendir.

Sizlere her konuda yardımcı olacağımıza emin olun. Sizden ricam, kasabamız ve Tepeköy ile ilgili bir çalışma yapmanızdır.

Mesut Doğan

Radolfzell-Almanya

ECÊBA ME KURDAN !

Miletê kurd miletêki ecêb e. Serhişk e. Ji bo gorandina hinek mentalîteyan ger hîn pir sal derbazbin. Ê me yên xwendî an nexwendî(cahil) em karin bibêjin hemû yek in. Tû ferk di navbera wan de tûneye. Ê cahil (nexwendî) zaten belî ye, ê kû xwenndiye jî, jî xwe re xwendiyê tû faydê xwe li dêrûdora xwe ra nabe. Ê şûna xwe da rûne pir kova bike. Filan kes rind e, filan kes ne rind e, filan dewlet rind e, filan dewlet ne rind e. Lê ji bo miletê xwe, yan jî ji bo welatê xwe tû tişteki konkret nake. Her tişt bi gotinan, bi qiseyan dimînê. jî xwe ra jir in, li diji miletê xwe şêr in, kêhrêman in, jê hatîne. Lê li bêr du cendermeyên tirk dibin pisik. Tû rabê, kalê haftê 70 salî reyisê belediyê î 35 salî, jî bo avê, bikuje. Em bên kalê haftê salî cahil bû, lê qet dorberê vi insanên ku hêşê xwe digên tûnebûn, ku lê ra bigotana; kalo va va ye, va jî va yê. Di sedsalê bistûyekan de buyerên sedsalên dehûsîsê têne holê. Le me got, ser hişk in, li ser vê henek jî hene (mezeke birnebûn hejmar 9, rûpela 31)

Neysê em pir dirêj nekin, werin ser mesela xwe. Lê de tu were, ecêbeka din a kurdan heye. Pirê caran jina malê tim mêrê malê ra dibêje; “Falan kes va kiriye tu çima nakî?” Misal: *Falan kes xanî çekiriye, tu çima çênakî? Falan kes erebe kiriye, tu çima nakirî? falan kes kamyon kiriye, tu çima nakirî? Falan kes çûye Ewropayê, tu çima narî? Tu qes vî tûneyî, ev dîke tu çima nakî?*

Ne ku li kapasita xwe mêze bike, dikare van işan bike an na, jî gundên xwe bêtir ti gund û bajarên din ne dîtine, radibin tên Ewropayê. Ne ziman, ne

meslek! Tu lê dipirsî; tu e çî işî bikî? bersiva xwe: Ez ê her işî bikim. li ser van tiştan M. Lewendî biçêk nivisandiyê, (Mêzeke: *Computera ber dilê min*, weşanên Apeccê) Neyse, em pir dirêj nekin, em werin ser mesela xwe:

Mirovekî waha radibe tê Ewropayê. Sima xwe çil e, mina ewropayîyan e. Tê Danîmarkayê bê resmîyet(bê kaxit) karekî xwe dibîne dişixule. Rokê li iş der tê diçê mal, li rê da polis kontrola pasaportan (nasnameyan) dikin, li ser vî tu tişteki tûneye. Famdikin ku va bêresmîyet dişixûlî. Dikin hudutdîşî bikin, lê nizanin jî kijan welatî ye. Ji ber ku î çil e, terin bang hemû konsolosên biyaniyan dikin. Pê ra dipeyivin, lê va disa bersiv (cevap) nade. Paşê mezê dikin, dibên konsolosxana Tirkan maye, em bang wana jî bikin, dibê ku va mirovê çil(zer) Tirk be. Konsolosa Tirk tê, pê ra kîse dîke, lê wa disa bersivê nade.

Ê tirk di berxwe da dibê: *-Bu adam Türkçe bilmiyor. (Va mirova tirkî nizanî.)*

Î me dibîze, tê xwe û dibêje: *Çing bilmiyor, gotiyek bilmiyor, Lo lo biliyor biliyor (dizaniye dizaniye) şenakiye bê, bê !*

Jordan

Narîne

Narîne dilê min tişewitîne
Kezewa min tihêlinê
Bejn zirav por zerîne
Delala dilê minê Narîne
Narîne bejn ziravê
Kinc tişuşt li ser awê
Sîngê gewr gûliyê li navê
Carek ramûsem xêra bawê Narîne

Narîn Qiza xelikayê
Dilê xortan tê dayê
Kî dibê ci ma bêje
Dilê min ser gîşka ra ye

Kemal Karımcı / Köln

ZIMANÊ DAYÎKÊ GIRÎNG E!

Mamosteyên kurd yên li Elmanyê dersên zimanê kurdî didin, ji kovara me ra nivîsa li jerê şandin. Memosteyên heja, xastineka ji dilê me anîne ziman. Em jî ji bo ku zimanê kurdî pêşkeve bala xwendevanên xwe dikşînin ser vê xebatê.

Redaksiyon

Redaktora/Redaktorê Hêja!

Em mamosteyên Kurd yên li cyaletên Westfalya-Bakûrê Raîn (NRW) û li Saksina Jêrin (Niedersachsen) dersa zimanê Kurdî didin, di rojên 24/25ê Sibatê 2000 de ji bo kar û xebata zimanê Kurdî hatin cem hev. Di vê civîna xwe de em li rewş û rola çapemeniya Kurdî, di warê perwerdayê de jî sekinîn.

Di vî warî de em gihîştin encamekê, ku rola çapemeniyê di warê perwerdayê de gelek mezin e. Ji ber vê yekê daxwaz û hêvîyên me mamostan ji we, redaktorên bi rûmet ev e; ku çapemeniya kurd di pêşerojê de vê rola xwe çêtir û jîrtir bidomîne.

Em, memoste di vî warî de ji bo alikariya we amade ne. Lê ji we jî hin daxwaziyên me hene:

- ♦Berî destpêkirina nûçeyan bala temaşevanan, dê û bavan bikişînin ser dersa zimanê Kurdî: Wek bi rêya spot û hwd.
- ♦Di rojname û kovaran de danasîn û reklama dersa zimanê Kurdî were kirin û agahdarî were dayîn.
- ♦Di rojname, kovar û televîzyonan de bi memosteyên kurd, yên ku niha dersa zimanê Kurdî didin re, hevpeyivîn werin çêkirin, çap kirin û weşandin.
- ♦Di weşan û bernameyan de li ser giringiya zimanê dayîkê were sekinandin. Divê bi vê armançê bi pisporan re civîn werin amade kirin.
- ♦Ji bo ku dê û bavên kurd zarokên xwe bêtir bişînin dersa zimanê Kurdî, formên qeydkirinê -bi Almanî û Kurdî çapkirî- bi rojname û kovaran re werin belavkirin.
- ♦Di weşanan de quncikekî ji bo dersa zimanê Kurdî were amade kirin.
- ♦Ji bo ku dersa zimanê dayîkê bi Zazakî û Soranî jî were dayîn, em alikarî û piştgiriya We dixawazin.

Em silavên xwe yên germ ji We û hemî xebatkarên We re pêşkêş dikin û di karên We de serkeftinê dixwazin. 25.02.2000

Hasan Taşkale, Süleyman Ateş, Mahmut Aydın, Ali Belîr, Cemal Düzgün, Ectah Tımar, Kazım Özdemir, Ali Tuku, Mahmut Akbayır, Mehmet Tanrıku.

Li Elmanyê li bajarên; Hamburg, Bremen, Hanover, Celle, Oldenburg, Osnabrück, Bielefeld, Dortmund, Duisburg, Köln, Bergisch Gladbach, û Bottrop, dersên zimanê Kurdî (Kurmançî) di dibistanan de berdevam dikin.

Prof. Dr. WOLF-DIETER HÜTTEROTH İLE BİR SÖYLEŞİ

"BİRKAÇ AY BOYUNCA KÖY KÖY DOLAŞIP, YAŞLI
İNSANLARA SORARAK EN İYİ BİLGİLERE ULAŞABİLİRSİNİZ!"

Okuyucularımız sizi, kitaplarımızdan İç Anadolu (Konya-Ankara) Kürtlerine ilişkin olarak yayınladığımız alıntı ve çevirilerden dolayı tanyor. Sizi birde sizin anlatımınızla tanıyabilirmiyiz?

Hütteroth: Ben 69 yaşında emekli bir Coğrafya Profesörüyüm. Yaklaşık kırk yıldır Şark (Oryent) ülkeleri konusunda uzmanlaşmış olan Erlangen Üniversitesi'nin coğrafya bölümünde öğretim görevlisiyim. Anadolu, Ürdün, Suriye ve İsrail üzerine çeşitli yazılar yazdım.

Yazdığım kitaplardan yeni olan, N. Göyünç ve W.-D. Hütteroth'un yazdığı "Sınırdaki ülke-16. yüzyılda bugünkü Türkiye-Suriye-Irak sınır bölgesinde, Osmanlı İdare Sistemi" Eren yayıncılık, İstanbul 1997 adlı kitaptır. Ancak bu kitabın konusu Kürtler değildir.

Aynı şekilde, bölge Kürtlerinin nerelerden geldiğinde benim tarafımdan bilinmiyor.

Ama bu konuda, iyi yetişmiş bir dil uzmanı, doğu bölgesindeki lehçe ve şivelerle benzerlik tespiti yapmak suretiyle belki bir sonuca varabilir.

Şu ana kadar, her şey henüz çok muğlak...

Kürt konusuyla ilk tanışmanız nasıl oldu?

Hütteroth: Sayın Bruïnessen'in (Hollandalı Kürdolog Ç.N) 1996'da, "Şehirlerde Kürtler" adı altında Paris'te düzenlediği seminerde, 16. yy'da Diyarbakır Eyaleti sınırları içinde yer alan bazı şehirler üzerine yaptığım konuşmayı bir

yana bırakırsak, 1960'dan bu yana doğrudan tek bir kere Kürtler konusuna değindim. 1968'de yayınlanan Habilitasyon çalışmamda konuya değinmiştim. Bu çalışmamda, Haymana'nın güneyindeki dağlık bölgede bulunan Kürt köylerini gösteren bir harita da yer alıyor (s.37). Bölgeye ilişkin bildiğim bu kadardır. Bu konuda ayrıca sahip olduğum diğer bilgiler, sizinde bildiğiniz, Perrot'a dayanıyor.

Anadolu'nun iç kesimlerine ne zaman ve hangi amaçla gittiniz?

Hütteroth: Karacadağ yöresini iyi tanyorum. 30 yıl önce bu bölgeyi jip ile çok gezdim. 1962/63 de, "Landliche Siedlungen im südlichen Inneranatolien in den letzten Vierhundert Jahren" (1968) adlı kitabımdan dolayı epey dolaştım oralarda. Orada bulunan bütün köyleri tanyorum. Jip'le Karacadağ'ın zirvesine kadar çıktım ve oradan muhtemelen galatik bir şehrin kalıntısı olan halka biçimli duvarların fotoğrafını çektim (Yarışlı köyü yakınlarında).

Son kez bölgeye 1980'lerde gittim.

Okuyucu ve yazarlarımızı, öncelikle Kürt aşiretlerinin İç Anadolu'ya ne zaman ve hangi nedenlerden dolayı göç ettikleri, ana Kürt yerleşim bölgesinin hangi yörelerinden kopup geldikleri ve bu göçün mecburi iskan ve sürgün olup olmadığı ilgilendiriyor. Bu konuda bize neler söyleyebilirsiniz?

Hütteroth: Kürtlerin Haymana'ya geliş tarihleri bilinmiyor. Benim bildiğim 16. Yüzyılın Osmanlı kayıtlarında sözkonusu bölgeye hiç değinilmiyor. (Son yayınlansı 1984: Başbakanlık Devlet Arşivleri Genel Müdürlüğü, Osmanlı Arşivleri Genel Müdürlüğü, Osmanlı Arşivi Daire Başkanlığı: 438 numaralı muhasebe-i Vilayet-i Anadolu Desteri 937/1530). I:-Kütahya, Kara Hisar-i Sahip,

Muhtemelen, bir kaç ay boyunca köy-köy dolaşıp yaşlı insanlara sorarak en iyi bilgilere ulaşabilirsiniz. Köylerinin tarihini en iyi onların bilmesi daha bir mümkündür.

Sultanönü, Hamid ve Ankara livaları).

O zaman sancak olan Ankara'nın sınırı hemen Ankara'nın biraz güneyinde son buluyordu. Daha güneye doğru ta Konya'ya kadar uzanan alan ise göçebe bölgesi.

Sanırım o dönemin mahkeme sicillerine bakmak bir ipucu olabilir. Bildiğim kadarıyla, Anka-

ra'ya ilişkin mahkeme protokolleri oldukça eskiye dayanıyor; 18. Yüzyıldan itibaren mevcuttur. Devlet kütüphanesinde bu konuda daha kesin bilgi olması gerekir. Yine de, sözkonusu Kürt yerleşim yörelerinin bu çerçeveye dahil olup olmadığı soru işaretlidir.

Sonuç olarak, Kürt aşiretlerinin Haymana bölgesine ne zaman geldiği konusu henüz net olarak bilinmiyor. Ben bölgede bulunduğum sıralarda, "200 yıl önce" sözünü duydum. Ancak 200 yıl sıkça söylenen standart ve inandırıcılığı tartışmalı olan bir söylem.

Aynı şekilde, bölge Kürtlerinin nerelerden geldiğinde benim tarafımdan bilinmiyor. Ama bu konuda, iyi yetişmiş bir dil uzmanı, doğu bölgesindeki lehçe ve şivelerle benzerlik tespiti yapmak suretiyle belki bir sonuca varabilir. Şu ana kadar, her şey henüz çok muğlak. Kanuni Süleyman'ın zoraki iskan konusunda hayli başarılı olduğu biliniyor. Ama sözkonusu bölgeye ilişkin olarak herhangi bir şey rastlamadım.

Görüyorsunuz, çok az şey biliniyor. Ancak bölge insanı olarak sizlerin bu soruna elatmış olmanızı sevindirici buluyorum.

Peki, sözkonusu sorulara cevap arayan ve konuya ilişkin olarak araştırma yapmak isteyen Kürtlere hangi kaynaklara başvurmalarını tavsiye edersiniz?

Hütteroth: Şu an hiç bir tavsiyede bulunacak durumda değilim. Ama siz bir başlangıç yapmış bulunuyorsunuz ve bundan sonra, birileri bana bu konuda bir şey sorarsa, ona sizi tavsiye ederim. Ümit ederim ki, bu konuda, sizin gibi bölgesel-tarihsel araştırma yapanların sayısı artsın.

... Kanuni Süleyman'ın zoraki iskan konusunda hayli başarılı olduğu biliniyor.

Muhtemelen, bir kaç ay boyunca köy-köy dolaşıp yaşlı insanlara sorarak en iyi bilgilere ulaşabilirsiniz. Köylerinin tarihini en iyi onların bilmesi daha bir mümkündür.

Sorularımıza verdiğiniz cevaplardan ve çalışmalarınızla bize kaynak sunduğunuz için size teşekkür ediyoruz.

Hütteroth: Yukarıda adını andığım kitabımın kalan son iki nüshasından birini size hediye ediyorum. Hediye edebileceğim sizden daha iyi birilerini bilemiyorum. En iyi dileklerle.

Bu röportajı ve Almanca'dan Türkçe'ye çevirisini Birnebûn adına Nuh Ateş yaptı.

Kitêbeka nû

Nivîsa Georges Perrot ya li ser Kurdên Heymaneyê ku me di sê hejmarên Birnebûnê de bi kurdî belav kiribû, wergêrê wê Dr. Fawaz Husên bi pêşgotinek dirêj û vegotineke têbîniyên Kurdên Heymaneyê wek kitêb amade kiriye. Kitêb ji aliyê weşanxana Apecê ve hatiye weşandin. Hûn dikarin Kitêbê li navnişanên li jêr peyda bikin:

Li Almanyayê:

M. Özgür/Birnebûn

Postfach 900348, 51113 KÖLN/Almanya

Telefaks: 0049-(0)2203-301630

Li Swêdê:

Box: 3318, SE 163 03 Spånga / Sverige

Telefon: 0046-(0)8-761 81 18

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-Mail: apec@swipnet.se

Georges Perrot



KURDÊN HAYMANAYÊ

Roportajek bi Qasim ê Heci Memed va

QONAXÊN KOÇERÎYA MALBATEKÊ

(Tekman, Germik, Enqere, Asslar)

Roportaj: *Nûh Ateş*

Bavpîrê te li gundê Şemê (Tekman) hatiye dunê. Lê tu û bavê te, hun her du li gundê Germikê (Kulu) hatine dunê. Ji kurikên te hen li Enqerê hen jî li Asslarê (Elmanya) hatine dunê. Bavpîrên te çima û kîngê jî Şemê barkirina hatina Germikê?

Qasim: Qaso bavê kalikê min bûye. Ez jî bi wî hatime navkirin. 115 sal berê jî gundê Şemê barkiriyê hatiye Germikê. Wexta ku hatine, kalikê min Haso 12 salî bûye. Du malbat hatine. Berê hatine li gunde Omera (Kulu) cîwarbûne. Paşê hatine Germikê, dûra çûne Celikan, Kirkpınar (Kulu), li dawiyê dişa vegeerîne Germikê. Du lawê Qaso hewûne; Heso û Remazan. Ji piye Remêzên tene keçik bûne. Du lawê wî hebûne, lê mirine. Bi gotina mezina ocaxê wî kor bûye. Ji piyê Heso 5 law 2 keçik bûne. Yek jî wana Memo bûye. Memo hawê min e. Tenê jî piyê Memo huro 18 mal pêyde bûne. Malbata Qaso jî eşîr/qebîla Dimiliya ye. Wexta ku malbata Qaso hatiye, Germik hîngê 20-30 mal bûye, niha sed mal heye. Sebeba barkirina mala Qaso kes nizan e.

Malbata kalkê bavê te hat li Germikê bi şun bû. Ji hîngê vir da, evqas sal derbasbûne, qe kesî negotiye, werin em bi şunda vegeerîn gundê Şemê, yan jî em herin mermaliyên xwe yê li gundê Şemê biwînin?

Qasim: Na, negotiye. Bi gundê Şemê va, bi mermeliyên me yê li wê derê va pêwendî nemane. Çûyîn û hatin qet tunebûn. Salê min 70 ye. Ez jî qe neçûmê gundê Şemê, nasnakim.

Wexta ku mala Qaso hat li Germikê hewîrî û li wê derê cîwarbû, kesî jê ra tu şor nekirine ?

Qasim: Wexta ku ecer hatinê, cîwarbûna wan bi zehmet bûye. Hîngê li Germikê Kurmanc hebûne (Xelikî). Wana siftê nexwastine ku van malbatên ecer hatî li gund bi ci bibin. Ê me bi zora çê li wir bi şunbûne. Sewa ku malbata me çend sal peşê hatiye, navê wan "Mehcîr" lê kirine, hin jî ji me ra diwên "Mehcîr" û Mehçîran biçûk dibînin.

Malbata we li Germikê dewara xwe bi çi dikir?



Qasimê Heci Mehemed bi torinê xwe ve

Qasim: Bi şivanî, pez xwedîkirin û rençberiyê. Lê wexta ku nufusa me zêde bû, êdin dewara me bi pêz û rençberiyê nedibû.

Koçkirin, malbarkirin bûye qedera we. Ji koçkirina Qaso şunda jî we malbarkiribû Enqerê. Wê çima Germik cihîşt hun çûne Enqerê?

Qasim: Ji hatina malbata Qaso 71 salan şûn da, me carek din barkir. Vê cara me jî ber çetînayî û tuneşîyan barkir. Çûn Enqerê, li wê cîwarbûn. Ji yê ku barkiribûn bajêr, malbata me ya siftê bû.

Sala 1956 an bû, wexta ku me barkir çûnî Enqerê. Ji hingê pê va em li wir dimên. Ji mala me (Mala Heci Memed) em du bira sala 1970 çûn Elmanya. Ez li bajarêkî biçûk (Asslar) 20 salan şuxilîm. Niha emekdar im û li Enqerê dimêm. Lê sê keçik û pênc neviyê min li Elmanyê dijîn.

Ku meri jî te bipirse, bive welatê te ku der e, tê çi cewabê bidî?

Qasim: Pirseke zor e. Li ku derê dijî ew dera ye. Herda ku ez li hatime dunyê ye welat. Ew jî Germik e.

Em tenkê jî qala kultura folklorî bikin. Ji vê kultura xortaniya te çi tê bira te?

Qasim: Kal û pîran çêrok digotin, lê tu di bira min da neman. Klamên kevn, ê egît û dilan digotin: Dewreşê Ewdî, Meme Alan, Hesenê Elî Begê, Cebelîyê Mirê Hekkarî....

Di wexta xortaniya min da bilûrvanên meşhur hebûn. Apê min Huso jî xweş li bilurê dixist. Omê Kerrê jî bi nav û deng bû. Bilûrvanên wan derdoran yekcaran dihatin ba hev, diketin lacê bilûrvanan. Niha, niha êdin kesên ku li bilurê dixin neman. Wana jî barkirin, çûne dunya wî alî... (bi van gotinan va girî-N.A.).

MÎYA STEWR Û ŞIVAN

Nuh Ateş

Hecîyê Alê mêzkir, ku mîya sewr ji ambara cê derdikevê. Ew mîna ku bi cina ket. Wî da dû wê û li pêş malê gihêştê; pê girt, bi hêrs, ew heta qîrara sîngê xwe berjor heyne, paşê ji jor da, girm bi herdê va da. Ew bi çoka li ser mîyê rûnişt, dest kire qirka wê û dev û pozê mîyê gesdikirin. Tê bigota, ewê niha mîyê vetisîne.

Jina Hecî ya duduya, Zêwê li ser çardaxê, li merê xwe sêrdikir. Wê kire qîrînî, got:

- Wêy wêy wêy, keçê û lawo xwe bi bavê xwe gihînin, ewî ke mîyê bikujê!

Keç, law û bûkên malê bezîyan, xwe gihandinê û Hecî bi zorê zewtkirin, mî ji dest xelaskirin.

Çav di serê Hecî da gewr dikirin û dilîstin, tê bigota ewê ku jî qawa xwe derkevîne. Dev û ruyên wî ji hêrsa ra sûr û pindurî bûwûn. Wî lêva xwe ya jêrî geskiriwû, hîn îza didana lê xay dikir.

Jina wî, Zêwê dîsa bang kir, got:

- Mêro mêro, ne rûyê tê sipî ne, tu jî xwedê natîrsî, tê xêr e, te xwe kiriye rûswa, tu bûyî hevalê mîyekê! Xwedêkê çir bûye, te xwe veng kiriye eşohret, lê ku xelk biwîne, wê bi te bikene, dîngo!

Hecî çavên xwe belkîrin û berdane wê, got:

- De, deng meke, mageyê ji kera ye!

Dû ra, wegerî lawê xwe û gote wî:

- Siwê, wextê ku te nanê şivanê pezê nêr bire çolê, vi xwe ra vê mîyê jî pewe, teve pezî nêr ke. Va mîrata ne dizê û şîr didê, ne jî goşt pêva heyê, ku tu şerjêkî. Bi ser da jî, herro dikevê ambar û aşxanan. Vê pewe, ma çavên min wê newînin.

Bi lêxistina Hecî, mî mîna ku sersem bûwû. Ew rawûbû ser nigan, lê bi zorê dadiwestî; vir da û wê da ditenişî, tê bigota ewa niha gêrbiwe.

Kuxe kuxa wê wû, mîna ku gewrîya wê xetimîwû. Bistkê şûnda, ew hate xwe û hema ji herda Hecî vi dÛrket.

Mî pîr wû. Ew di emrê xwe da qe nezayîwû. Hîn ku ew berxeke virnî wû, pît nexwaş ketiwû. Pire jar wû. Didan di dêv da feliqî wûn, tim bi zarêşe diket û nedikanî ku biçêre.

Mî, di eslê xwe da, heywanên kehîl in. Ew ji hev venaqetin. Tu ku da bîajoyî, ewê wê da herin. Lê mîya sewr ne weng wû. Ew yeke bi serî xwe wû, bi gûra kesî nedikir. Wê beran nêzke xwe nedikir. Ew tim jî keriyê pêz veqetî diçû û dihat. Ew her tim dikete ambar û aşxanan. Wê ji nanê nerm pîr hezdikir.

Ji ber van xûsîyetên wê, xêyrî jina Hecîyê Alê a siftê, kesî jî wê heznedikir.

Hecîyê Alê yekî dewlemend wû. Du keriyên wî hewûn. Yek pezê nêr wû, yek jî mîyê bi şîr. Pezê nêr li çolê dima, yê bi şîr dihate ser malê.

Hecî du cara zewicîwû. Jina siftê dotmama wî Gulê wû. Ji Gulê kurik nediwûn. Lowma, Hecî carke din zewicî û hewî anîwû ser Gulê.

Gulê jîneke bi bejn û bala û bi şûhret wû. Sewa ku kurik jî nediwûn, ew pîr vi ber xwe diket, mîna ku bi yas wû. Wê reş girêdida û tim bi xem wû. Li gora edetên wî zemanî, jina vê kurik, vê qîmet wû.

Dilê Gulê tenê bi mîya sewr diêşîya. Wê yekcaran, bi dizkî nan û cêyê herdî dida ber wê û rûdinişt, dest dida ber henîya xwe, bi çavên melûl lê sêr dikir û di berxwe da digot:

- Qedera min û te mîna hev e.

Mîya sewr jî meriya ditirsî, dûre dûre wan diçû. Lê ji Gulê neditirsî, diçû ser wê.

Havîn bû, wexta fîrîga hatiwû. Dora nîvro, pezê nêr jî gund dÛr, li neqewa kulik mexel hatiwû. Şivên li kêleka pêz, bi ço û kilavê xwe sîyek çekirîwû û xwe lê direjkirîwû. Wî çav li dorberên xwe digerlandin. Xaniyê gund jî dÛrva, mîna tolikên kurikan xay dikirin. Çend gavan jî wî dÛr, qefle bi qefle kusîyên rixê li ser rixa pêz dadiniştin. Wana bi lez rix par bi par dikirin. Her yekî parek dikir qîlotik, bi nigên xwe yên paşî bi herdê da lûtdikir û dibir.

Der û deşt tijî rix bû, dîsa jî kusîya li ser parvakirina rixê hing dikirin. Wana qîlotkê rixê jî dest hev radikşandin.

Kusîyekî bi birin jî kalkal berve kulçek rix teçû. Hêleke wî panpûç bûwû, mîna ku meriyekî yan jî hêwanekî pêle wî nawû. Wî hêla xwe ya birindar bi xurra dikşand. Mîrî, mêş û moz ketiwûn dû wî; di dorber wî ra wenig çexdibûn, ku tê bigota ewê benda mirinîya wî çavdikine.

Şerê kusîya li ser rixe, bi şivên ecêb dihat. Wî di ber xwe da got: „Carkê

mêzke hela, xwedê rizqê her mehlûqatekî dayîye. Para kusîyan jî rix e.“

Pêçekê şûnda, çav li şivên nerm bûn, ew kete xewê. Mîya sewr li ber xwe dida ku hawana nên ji têra bin balgîyê şivên derxe. Şivan bi xwe hesîya, bi lez rawû, ço heyna û da dû miyê. Mî revîya, vî dûrket. Şivên bi kevr û kêseka tê kewdikir.

Mî ji pêz tenkê dûr dawestî û mîzkir. Bîna mîzê kete pozê berana. Pezê nêr xesandîwû. Lê birek beran teve pêz hewûn, ew nexasandîwûn. Du beran ji mêxel rawûn, duyên xwe yê gir li paş xwe çeng dikirin û berve miyê çûn. Ew giheştin ser mîza miyê. Mî ji wê derê vi durket. Wana bihn dikşandin û serî berjor heydînan. Paşê, ji hev vekîşîyan, li hev xistin. Ew her car dehpanzdeh gavan li ser kunê ji hev vedikşîn, paşê bi hemû quweta xwe diberizîn hev du, bi serîyên xwe yê hîşk gim û gim li hev dixistin. Mîya sewr ji dûr va, li wana sêrdikir.

Di jêrî mexel ra, çemekî tenik diheriqî. Berqan li kêna avê, li ser kevir û kuçkan xwe berroj dikirin. Her ku reqînîya lihevketîna serîyê berana dihat, wana culp û culp xwe diavêtin avê.

Li ber çêm kanîstankek hewû. Birek xort li wê dere rûniştîwûn. Wana hesp diçerandin. Demeke şûnda, şivên kera xwe barkir, hate ba wan. Wana firîgekî xwe ji genimê kundirî çêkiriwûn. Hen jê dane şiven jî. Pêy

xwarina firîg, xort li dora şivên civîyan. Yekî gota şivên:

- Xwedêkê, ji me ra qala serhevdeyên eşîr û qebîlan bike.

Şivên dîyê cixare kûr kişand û giran giran berdida. Bîskî şûnda destpêkir:

Li gundekî, bi navê Çilek û Tirek du qebîle hewûne. Ji qebîla çilekan hen hewûne, pire nefsker wûne; li rûniştînekê her yekî çel nan dixwarîye. Ji Tirekan jî yê Tirûste hewûne. Rokê yekî ji wana heft tirê bi bihn li dû hev kirine, bihna wan li heft gundan belav bûye û pê heftêûheft meri bîrva çûyîne.

Wexta ku di navbera her du qebîlan da şer çedîwûye, Tirekan ên xwe Tirûste diajotîne peşîyê. Çilekan jî yê xwe nefsker didana paşîyê. Di şer da Tirek tim vi serdiketîne. Wextê ku herdu hêl lihevdihatîne, Çilekan yê xwe nefsker dişandîne mîvandariya Tirekan û heyfa xwe jê heydînane.

Xortên li dora şivên bi van serhevdeyên qebîlan vîq û vîq û hîq û hîq dikenîyan. Ji kena gurçiyên wan diêşîyan.

Xortekî din, vê cara jî şivên pirsî, got:

- Tu tim li çolê yî, şevbider î, tu natirsî?

- Ji çî bitirsime? Şivên lê veğerand

- Ji gur û dizan, ji neysiz, cin û pêriyan! xort got.

Şivên dişa şor heyna, got:

- Kuçikê min, Devreş nahêle ku gur û diz nêzke pêz biwin. Devreş kuçikekî nov e, ewî bi cîsn e. Xwedîyê pêz ew ji Qangalê anîwû. Neysiz, cin û pêri nezke pêz nawin. Pez meleka ye, ku meri ji vidûrnekeve tişt pê nayê.

Bîst sala berê, min pez li deşta zîwên diçêrand. Şevereş wû, mîna ku gotî, çavçavan nedidîn. Ez li kêlaka pêz dawestîwûm. Dengê merikî hate guhê min. Min bang kir, got, „Ew kî ye? “ Wî got, „Ez im, Mehmede Kalê me.“ Mehmed li gundekî cîran şivani dikir. Nêzîkî min bû, got, „Selameleykum“, min got: „Alekeselam“.

Em runiştin. Min got, „Mehmed xêr e, şer e, tu vê çaxê li çi digeri“. Got, „min pez bi ser hevalê xwe da cihîşt. Ezî ku herime mal, kincê xwe biguherime“.

Bîstek derbasbû, min ji Mehmed ra cixareke gewendkî pêça. Wexta ku wî heste vêxist, ku pê cixara xwe vêxe, min dî, ku çavekî Mehmed tune, ewî bi çavekî tenê ye.

Tirs kete dilê min. Canê min kirç kirçikî bû. Por li serê min tela bi telayî bû. Min di dilê xwe da got, „Welle va ne Mehmed e, ya neysiz ya cin e, ewî xwe kiriye tonê Mehmed.“

Pez tenkî jî me vidûrketiwû. Min got, „Mehmed tu pêçekê rûne, ku ez herim pêz çexkim, ezê zû vegerim.“

Ku çîng ez rawûm, min bazda. Bi rê da, min sê cara quluweluehet xwend û pife dorpaş xwe kir û min xwe gihande pêz; ketim orta pêz.

Hal û hekata min û cin û neysiz va wû.

Benz û bed li xortan qetîya bû. Wana, mîna ku heta dawîye hekatê nefesa xwe girtiwûn, kûr nefes berdidan.

Dane nivro, şivên kûpê xwe ji kanîstankê tijî av kir, kerê xwe barkir, xatirê xwe ji xorta xwast û çû herda pêz. Wî pez ji mexel rakir, anî ber çêm, avda, paşê berî berve çîyayê inê gewr, alêşkir. Wî dil hewû, ku îşev pêz li newala pîrkê biçêrine. Newala pîrikê li bogira çîyayê inê gewr wû. Li teniştên wê gîya pîr wû. Newaleke bi tirs wû. Digotin, zemanê berê, li newalê pîreke merxurî jîyaye û wextê ku meri bi şev di newala pîrikê ra derbasdiwe, xofekê digire ser wî.

Ro li ber ava wû. Nivê pêz li bewrarê newala pîrkê diçerîya. Çîyayê inê gewr nêzik wû. Di bogira çîyê da inêke mezin hewû. Têda keriyek pez ê bişûn biwa. Dev û derîyê inê ji kevirê gewr wûn. Lowma jê ra digotin, îna gewr.

Ji nişkava, ewrekî reşî û bar ji paş çîyê derket û bi ser newala pîrikê ra dagirt. Bi carkê ra newal şevereş bû. Girme girma ewra wû. Ji hêlkê da ji bruske vedina. Bihna baranê kete pozê şivên. Wî kire hay û bêrî, ku pêz ji newalê vi dîrxê. Baraneke vewext û pîr şên zû destpêkir.

Şivên dixwast, ku pêz bigêhîne îna gewr. Lê ji axzê çiyê da ba û baran dihatin. Lowma pez wêda nedîçû. Pêz pişta xwe di bê û baranê alkiriwû û gav bi gav herve newalê diçû.

Di bîstkê da, newal heta nîvi tiji av bû, lêh gûje gûj wû. Şivên ji hêla newalê da, geh ji par ra, bi şivê li pêz dixist, dikire vîte vît û kîse kîs, geh dibezî diçû aliyê din, tuv tuv bange pêz dikir, lê pêz bi ya wî nedikir.

Tîrs ketiwû nav canê wî. Xu li ketiwû. Çok di bin da sist bûwûn. Afat û tofanê dema berê, yên ku pê keriyên pêz telefbûyî, dihatin bîra wî; mîna şîrîtekê di ber çavên wî ra derbas dibûn.

Bîstkê, ew bi çokan kete herde, destvekirî û seri berjorkirî, li ber xwedê gerîya.

Wexta ku rawû ser nigan, mîya sewr vi ber çavên wî ket. Mî li axza çiyê, li jorî pêz bi tenê dawestiwû. Tê bigota, ba û baran, şilî û şepelî qe ne xema wê ye.

Şivan bezî, çû herda kerê. Hewana nê ji têrê derxist. Ew çû, nêzke mîyê bû, nan ji hewanê derxist, parî bi parî kir û avête ber mîyê. Wî vegna mî anî, di nav pêz ra derbaskir û herve çiyê çû û tuve pêz kir. Mîya sewr da dû şivên, pezê nêr jî xwe li mîyê girt herve çiyê kişiya.

Demekê şûnda pez giheştîwû îna gewr. Wî xwe li ber îne diçirpand,

şilîya ser herîya xwe davdişand û dikete hundurê îne.

Şivên arek dada û li ser zadekî xwe yî bi cizirik qeland. Çend nanê sêlê li ser têrê rexistin, zad li ser velokir. Paşê parî bi parî şiva xwe xwar. Mîya sewr nêzki wî dawestiwû. Şivên her ku parîyek şiv dixwar, parîyek nan jî diavête ber mîyê. Tîrsa mîyê çûwû, ew her çû nêzke şivên diwû.

Şev êpî çûwû. Şivên kilav li xwe kiriwû, têr ji xwe ra kiriwû balgî û xwe li ber êr dirêjkiriwû. Mîya sewr li hember wî, li hêla din a êr mexelketiwû.

Pez hîn dikayîya. Xîre xîra didanên pêz di îne da deng didan. Zengilên sûyê pêz jî, bi kayîna pêz dilivîn, dikirin tik tik, lîng lîng, ding ding. Tê bigota, orkestrakê di zikê çiyê da muzikê çedikê.

Şiyên pêtiyên êr didane diwarê îne; geh berjor geh berjêr diçûn û dihatin, mîna ku, xeyalet li ser diwarê îne direqîsîn.

Şivan li mîyê mêzkir, got:

- Di sayê te da, em hura ji afeteke mezin xelashûn. Bibaxşîne, heta niha min pir nerindî li te kirin. Niha şûnda, ezê nanî xwe li te parvakim. Ezê te ji xudanê tê bixwazim. Ezê biwê, „axao, mîya sewr bide min, wê têke ber heqî min!“

ÇİĞDELI

Çiğdeli'nin çayırı
Evimin arkasındaki bayırı
Erevgilin axırı
Hele yoxmı o gırı
Son kez olsun görmek isterim.

Bizim köyde yetişir
Arpa ce genim
Anam hergün yapardı
Kozi run pênr
Son kez olsun yemek isterim.

Ele simok'ların pezleri
ne güzeldi o çanları
hele yoxmı o kerleri
Son kez olsun binmek isterim.

Ehmedi Kınê'nın gr'e çıkışını
Erev'in kere binişini
Musi Home'nın çayıra yatışını
Son kez olsun görmek isterim.

Hacosman'ın bağında
Bako'nun Ayçiçek tarlasında
Heciyê Ehmedin elma ağacında
Son kez olsun yolmak isterim.

Mexmi koxe'dir köyün muxtarı
Ondadır herşeyin anahtarı
Ford motordur makam arabası
Son kez olsun görmek isterim.

Mami kale'nın şorları
Gelirdi hergün sêrpê koxıları
Ne güzeldi o komşuluk bağları
Son kez olsun görmek isterim.

Sabah saat beş
gelirdi düdük sesi
bu Osman'ın ekmek teknesi
Aşe Ramê'nın muavinlik etmesi

Son kez olsun görmek isterim.
Çiğdeli'nin vardır iki gölü
Arasındadır şose yolu
İçerisi Beq, moz, zîro dolu
Son kez olsun görmek isterim.

Mahmutlu'nun yolu
Köyde yağardı dolu
herkesin gözünde tarla yolu
Sonkez olsun görmek isterdim.

Hami Garê'nın erg yapışını
Ami Boze'nın tarla biçişini
Efendi'nin Eşek'le tarlaya su çekişini
Son kez olsun görmek isterim.

Çiğdeli'nin vardır cami'si
yanında büyük minaresi
İçinde duyulmaz ezan sesi
Son kez olsun duymak isterim.

Bekiri Berem'in naxırı
Nuruylah'ın vardır motoru
Bato'nun da biçereyi
Sonkez olsun görmek isterim.

Çibolî'nin kerî
yanında vardır pezleri
Akşam üstü çayıra çıkışı
Son kez olsun görmek isterim.

Alo'nun aşağı'dan motorla gelişini
Evinin önünde duracağına, balkona girişini
Öğretmenim yorganın çirt çirt ki olmuş deyişini
Son kes olsun görmek isterdim.

Size bu şiiri okudur
Bu köy nere diye sordur
Bu köyün adı Çiğdeli
Önünde'dir Üçkuyu
Arkasındadır Çamalax köyü.

Fahri, Xwendavan -Ankara

CELİKAN'DA KIYAMET

Muzaffer Özgür

Bir yaz günüydü ama hava serindi. Bugün, güneş buralara iyi gül-müyordu. Sabah saatleri de olsa bir anormallik vardı havada. Hafif bir rüzgar esiyor ve çıkardığı uğultularla kulaklara melodik sesler yankılı-yordu. Havanın bu durumu, geçen aylar için doğaldı ama bugün için insanları tedirgin ediyordu. Hasat yakındı. Ekinin başaklaştığı ve hasatın 2-3 hafta sonra yapılacağı bir zamandı. Tarih; 23 Haziran 1981, günlerden Sahydi. Havanın bu hali hasatı bekleyen köylüleri korku-tuyor, çaresizliğini yaptığı dualarla *'Xûdê ji afeta bîparêze.'* diye dışa vuruyodu.

Yağmur yağacaktı. Bu yıl, köyün çevresindeki arazi ekiliydi. Bahar döneminde yağışların yeterli olmaması nedeniyle ekinler cılızdı. Ar-palar sararmış ve uzaklardan diğer ekili tarlalardan ayırtedilebiliniyor-lardı. Tepeler ise azda olsa yeşilim-siydi. Sıcaklar meradaki otları ve çiçekleri kavurmuş, sarartmıştı. Tarla kenarlarında binbir renkten çiçek-ler açmış mis kokuları doğayı sar-mıştı. Rüzgarla gelen hava akımı

ekin tarlalarını dalgalandırıyor adeta koşturuyordu. Hışırtı, uğultu sesleri birbirine karışmış ve bu seslerle birlikte ekinler adeta halaya dur-muşlardı.

Kuşlar gökyüzünde uçşmuyordu. Yazın sıcağında, daha dün hatta sabahın ilk saatlerinde cıvı cıvı öten börtü-böcek, yuvasına çekilmiş, bazılarında korkularından bir yerlere sığınmıştı. Kırlarda koyun ve inek sürüleri yayılıyordu. Çobanlar doğa ile içiçe yaşadıklarından dolayı havanın yağış getireceğini tecrübe-leriyle tahmin etmişler, sürülerini köye yakın olan Bingöl bölgesine getirmişlerdi. Yağıştan enaz etkilen-mek ve sürüye zarar vermemek için köye yakın olmak istiyorlardı.

Parçalı bulutlu hava yavaş yavaş yerini kapalı bir havaya terk etti. Uzaktaki dağlar ve tepeler bir olmuşlar şimşekle dans ediyorlardı. Uzaklar iyi görünmüyordu. Çölyay-lası, Kelhasan hatta daha ötelelerde Akşehir dolaylarında yağmur vardı. Batı yönünden gelen yağmur, oraları ele geçirmişti.

Çorak damlı olan köy kahvesi her zamanki gibi doluydu. Tüm masalarda çeşitli oyunlar oynanıyor, bir yandan da hava sohbet konusu ediliyordu. İsmet amca ile Yusuf dayının tavlama maçı büyük ilgi görüyordu. Zarlar karşılıklı el değiştiriyor ve pulların takırtısı, kahvenin sigara dumanından sararan duvarlarında yankılanıyordu. Çaylar, kahveler, soğuk içecekler garson tarafından masalara taşınıyordu. Sigara dumanı dışarıdaki hava gibi egemenliği ele geçirmiş insanların tepesinde dans ederek havalandırmadan ve pencereden dışarı doğru uçuyordu. İnsanlar tavlama seyrediyor, oyun oynuyorlardı ama akılları havadaydı. Hava çok bozulmuştu.

Orta Anadolu'nun bu köyünde olacakları önceden hiç kimse bilemezdi. Belkide Yüzyıllık tarihlerinin en büyük felaketini yaşayacaklardı.

Okullar yaz tatilinde oldukları için çocuklar Kur-an Kursu'na gidiyordu. Bu nedenle Müftülük ikinci bir imam köye tayin etmişti. Ayrıca 7-8 yıldan fazla bir süredir köyde görev yapan ve köylülerin kendisine "**diyoru**" dedikleri bir demirbaş cami imamı vardı. Konya'nın güney ilçelerinden birindendi. Diyoru kelimesini çok kullandığı için köylüler ona bu adı takmışlardı. Köyde sevilmiyordu. Farklı insanlar tarafından defalarca kovulan bu imam, çok fesat ve çıkarıcıydı. Köyün başına bela olmuştu. Köydeki bazı yağcılar vasıtası ile ve özellikle devletle olan özel ilişkilerinden dolayı! Köyde kalmıştı. 12

Eylül askeri cunta dönemi öncesi ve sonrası bazı köy gençlerinin devlet tarafından sorgulanmasında bu imamın rol oynadığı biliniyordu. İkinci imamın gelmesiyle birlikte ona ilgi azalmıştı. İnsanlar yeni imamlarına, ona karşı sahip çıkıyorlardı.

Köylülerin yeni imamı sevecen, sakacı ve geveze bir insandı. Çalışkan olması köylülerin onu özel işlerinde de çalıştırmalarına vesile oluyordu. Bahçe, inşaat, tarla vs. İşlerde çalışmasını ve köylülerle samimiyetini diyoru kaskanıyordu. Bu imam futbol sahasında gençlerin futbol karşılaşmalarını seyrediyor, onlarla birlikte voleybol oynuyordu. Kısa sürede bu ilişkilerinden dolayı köylülerle çok samimi oldu. Bu da imamlar arasında bir rekabet yaratmıştı.

Köyün camisi 50'li yıllarda yontu taştan yapılmış yüksek bir yapıydı ve üstü kiremit çatı ile kapatılmıştı. İç motifleri göz kamaştırıyordu. Tavan, tamamen parça parça çam ve gürgenden yapılan el ürünü motiflerle süslüydü. Hutbesi, minberi, girişteki sağ ve sol tarafta bulunan küçük bölümünde aynı ağaçtan yapılmış çeşitli süslerle kaplıydı. Köyde elektriklerin gelmesiyle birlikte ışıklandırma ve ses düzeni ile daha da modernleştirilmişti. Taban kıymetli ve çeşitli boyutlardaki halı ve seccadelerle kaplıydı. Sille, Uşak, Gördes, Van, Kars vs. halı motifleri zemini güzelleştirmişti.

Vakit öğleni geçmişti. Ezan okunmuş, namaz kılanlar camiden sonra evlerine dönmüşlerdi. İşte tüm

olacaklar bu süre içindeki imamların aptallığından dolayı meydana gelecekti. Ezanı okuyan imam camii anfisini açık bırakacak ve köylüler bir cehennem yaşayacaklardı.

Öğlen namazından sonra yağmur şiddetli bir şekilde yağmaya başladı. Sicim gibi, bardaktan boşanırcasına yağıyordu. Gökyüzü simsiyah olmuş, görüş mesafesinde daralmıştı. Şiddetli yağmur seller oluşturmuştu. Köyün kuzeyinde bulunan Harita tepesi sellerin oluşmasına şeflik yapıyordu. Bu tepe, adını askerlerin 2-3 yılda bir gelip orada topoğrafik çalışma yapmasından alıyordu. Asker gibi acımasız ve gaddardı. Sel oluşunca Köy ikiye ayrılır tüm ilişkiler kopardı. Aşağı ve yukarı mahalle sakinleri birbirlerine ulaşamazlardı. Tek ulaşılacak olanak Şerefli Yolu üzerindeki köprüydü. Bazen seller bu köprüyüde kaplar, bu olanak ortadan kalkardı. Bu kez de aynı oldu. Sel geçtiği tüm yerleri yıkıyor ve sürüklüyordu. Köy meydanında çok geniş bir sel oluşmuştu. İnsanlar evlerine kapanmış ve tedirgindi. Şiddetli yağış ekinlere zarar verecek boyuttaydı. Köyün merkezinde bulunan bahçeler sel sularıyla yıkılmıştı. Köylülerin, bahçelerinde yetiştirdikleri tüm ürünler tahrip olmuştu.

Merada bulunan hayvanların büyük bir bölümü maalesef köye ulaşamamıştı. Akan sel sularına kapılan koyunlar telef oldu. Çobanlar kıyameti yaşıyorlardı. Canlarını kurtarmak için yüksek tepelere sürülerini sürmüşler fakat başarılı olamamışlardı. Semo, Tosun, Süleyman, Şeno ve diğer çobanlar canla-

rını zor kurtarmışlardı. Osman'da o yıl Bir sürü çobanı ile birlikte 3-4 aylığına davar gidiyordu. Süleyman ile birlikte koyunların sel sularına kapılıp telef olacağını anlayınca bazılarını kesmişlerdi. Onlarca koyun kesilmiş ve yoğun çalışmalarıyla tepelere taşınmıştı. Bazılarında sel sularından kurtaramamışlardı.

Gökürültüsüyle şimşek öyle bir çaktı ki; sanki, yer yarıldı, volkanlar patladı. Korkunç ses insanları çok korkuttu. Şimşegin ışıklarından aydınlanan köyde korkan insanlar Bismillah-Bismillah diyor ve dualar okuyorlardı. Şimşek bir yerlere vurmıştu. Birbirlerine şöyle sesleniyorlardı. **“Valle Brusکہ li derکہ xist - Vallaha Şimşek bir yere vurdu.”**

O yer köyün camisi idi. Öğle namazında okunan ezandan sonra imam ezan okunan anfiyi açık unutmuş ve şimşek açık elektrik yüklü cihazın çekim alanına girmişti. O anda köy meydanında bulunan elektrik trafosunda da patlama olmuş ve köyün elektrikleri kesilmişti. Yangın yavaş yavaş caminin içine yayılmıştı. Camiden yükselen dumanları görenlerin feryatları köyün her tarafından duyuluyordu. İnsanlar evlerinden çıkmış köy meydanına koşuyorlardı. Kahvehane bu seslerle boşaldı. Sicim gibi yağın yağmur insanları etkilemiyordu. Sel sularının azgınlığı ve Şerefli yolu köprüsünün sular altında olması nedeniyle aşağı mahalledeki insanlar öteki tarafa geçemiyor ve öylece bakıyorlardı. Yukarı mahalle sakinleri, caminin içindeki malze-

meleri kurtamak için gayret içindeydiler. İnsanlar; halıları, tüpleri, yorgan, döşek vs. malzemeleri kurtarmayı başardılar.

O zamanlar köyde manyetolu bir telefon vardı. Kulu'ya, Kozanlı'ya telefon edip itfaiye arabası isteyen aşağı mahalleliler maalesef olumlu cevap alamamışlardı. Şiddetli yağmur oralarda da vardı. Gelmeleri zordu. Tüm köy halkı oradaydı. Sel sularının her iki yakasında biriken erkek, kadın, genç ve çocuklar ağlamaklıydı. Caminin ahşap çatısı tutuşmuş ve çayır çayır yanıyordu. Bazı kadınlar ağıtlar bile yakıyorlardı. Köylüler için bugün gerçekten kıyamet günüydü. İnsanlar evlerini, mallarını, kırdaki hayvanlarını unutmuştu. Tamamen tutuşan caminin çatısı büyük bir gürültüyle çöktü ve yanmaya devam etti. Doğa acımasızlığını göstermiş, tedbirsizliği cezalandırmıştı.

İlerleyen saatlerde yağışın azalması ile birlikte şokta atlatılmıştı. İnsanlar çevresine bakmaya, kendilerine yönelmeye başladılar. Selin azalması, aşağı mahalleden insanların köprü üzerinden camiye doğru gitmelerine kolaylık sağladı. İnsanlar kül olan caminin çevresinde konuyu tartışıyorlardı. Kutsal olan bir mekanın yanması insanlarda korku yaratmıştı. Allah tarafından olan bu olay neden, niçin olmuştu. İnsanların bu tartışmaları fazla dine bağlamak istemiyorlardı, çünkü manevi inançları zayıflardı.

Kırdaki sürülerden arta kalan koyun ve inekler köyden giden insanlar tarafından toplanmış ve getirilmişti. Çobanlara ulaşıldı. Hepsi sağdı ve büyük bir iş başarmışlardı. Onlarca koyunu kesmiş ve boğulmalarını önlemişlerdi. Bunun yanında boğulan onlarca koyunda vardı. Traktörlerle, kesilen koyunlar buldukları yerlerden toplandı ve sahiplerine dağıtıldı.

Yağış tamamen durmuştu. Aniden bir siren sesi duyuldu ve Kulu'dan itfaiye arabası geldi. Hoş gelmişti ama geç gelmişti. Anadolu'da bu sahne hep yaşandığından insanlar umursamadılar bile. Gelenler, geldikleri gibi geri döndüler.

Diyoru ile Şişko'nun rekabeti büyük bir felakete neden olmuştu. Köylüler senaryolar anlatıyor ve birbirleriyle tartışıyorlardı. Nereden olduğunu hatırlamadığım bir bilgi anfinin açık bırakıldığını, bunun şimşegın çekimine neden olduğunu bilimsel olarak açıklamıştı.

Allahın emri! Diyerek bu olay hakkında bir araştırma, soruşturma o zamanlar yapılmamıştı. Bunu yapmak isteyen kimileride engellenmişti. Diyoru ile Şişko bu olaydan dolayı çok azar işittiler ama ne fayda. Yeşilyurt sakinleri kıyameti yaşamışlardı. Bu şokla bir günde bitti. Caminin yanması ve ekin tarlalarında meydana gelen zararın tartışılması uzun zaman sürdü.

XELİKAN AŞİRETİ

Yakup Şimşek

Günümüzden yaklaşık iki asır önce orta Anadolu'ya göç eden, ülkelelerinden koparılan onlarca Kürt aşireti gibi Xelikan'larda Orta Anadolu'nun çorak ve kurak denilebilecek verimsiz topraklarında yaşam mücadelesi veriyorlar. Kimilerinin göç, kimilerinin sürgün, kimilerinin mecburi iskan dediği Orta Anadolu Kürtlerinin göçünü, nereden, niçin ve nasıl geldiklerini tam olarak bilemiyorlar. Bilinen tek bir gerçekleri var oda Kürt oldukları ve Kürdistan'dan geldikleridir.

Son zamanlarda Birnebnun dergisi çevresinde yapılan araştırmalar ve bazı Avrupa'da yaşayan aydınlarımızın araştırmaları dışında, özellikle yaşlılarımıza sorarak, onları kaynak göstererek, belki çoğu meseleyi daha özünden belgelememiz mümkün olurdu diye düşünüyorum. Nihayetinde onlar geçmiş tarihimizden kalan tek gözlemlerimiz ve geçmişimizin varisleridirler. Bu anlamda İç anadolu Kürtlerinin nereden ve nasıl geldiğinin tam olarak belgelenmesi birazda ayrı bölgede yaşayan insanların kendi aşireti içinde gerek resmi kaynaklar, gerekse yaşlılarımızdan aktarılan bilgilerin toplanıp birnebnun'da yayınlanmasının faydalı



olacağını düşünerek bende Xelikan'lar (Gölyazı) üzerine yazmayı faydalı buldum.


Alakom har skrivit boken efter flera års forskning och resor till Kurdistan. Boken innehåller en rikligt utvald material som visar på den långa och varierade historien mellan Sverige och Kurdistan. Han beskriver bland annat handelsrelationer, krigsrelationer och kulturella utbyten som ägt rum över de senaste tusen åren.

Boken är en viktig bidrag till kunskapen om den svenska kurdiska diasporan och deras förhållande till hemlandet. Den är en läsvärklig och intressant läsning för alla som är intresserade av historia, kultur och internationella relationer.

SPÅNGA Spånga - 12 Minuter från Stockholm C

BLADET

Tal av Ulrica Messing

Tal av Integrationsminister Ulrica Messing vid invigningen av Kurdiska bibliotekets utställning, Svensk-kurdiska relationer.

Flysta-förlag nomineras till August-pris

Li rojnamên Swêd yê Rojane û heftayî



Ulrica Messing och en annan person vid invigningen av Kurdiska bibliotekets utställning.

Kitêba ku herî zêde balê dikişîne ser xwe ya Rohat Alakom "Svensk-kurdiska kontakter under tusen år" e. Heta niha rojnamên mezin û heremî berfireh cih dane kitêba R. Alakom. Riksradioyê li ser vê berhemê programeke taybetî weşand û du civin, yek di pêşengeha li Rinkeby 12/03/2000 û ya din berî vê civînê, di encama hevkarîya Weşanxaneyâ Apecê û Kitêbxana Kurdî li Stockholmê, roja 03-02/2000, ku wezîra Entegrasyonê Ulrika Messing xwedî gotin bû, li ser vê berhemê pêkhatin. Em karin wê yekê bêjin ku hîn wê gelek peyv li ser vê berhemê bêne gotin û nivîsandin.

Xwendevanên me, nivîskarê kurd Rohat Alakom ji medya kurd(çi bi kurdî û çi ji bitirkî be) kêr zêde bi qasî me nas dikin. Nivîskar bi eslê xwe ji Kurdistanê, ji Serhedê ye. Piştî cunta eskerî li Tirkîyê ya di îlona 1980an de welatê xwe terk kiriye. Demeke kin li Alamanyayê û ji sala 1983an û vir de li Swêdê dijî. "Svensk-kurdiska kontakter under tusen år" kitêba

yekemîn a Rohat Alakom e, ku bi swêdî çap bûye. Kitêb 265 rupel e û ji çar beşan pêk te.

Beşê yekemîn li ser têkiliyên kurdan û Vikingan e. Bav û bapîrên swêdiyan di av û çemên Rûsya re heta bi başûrê çiyayên Qaf û navbera Dicle û Firatê çûne. Beşê duhemîn li ser pêywendiyên kurd û swêdiyan, di dema desthilatdariya Osmaniyan de ye. Di vê demê de geh li dijî hev û geh bi hev re li dijî Rûsya şer kirine. Beşê sêhemîn ronahiye di xebata "misiyonerên" swêdî li Kurdistanê û nemaze xebatên wan di nav kurdên Êzîdî de ye. Di beşa dawî de Rohat Alakom lêkolînek bi rêk û pêk li ser Şerîf Paşa kiriye. Li vir Nivîskar bi bîra me tîne ku M. Emîn Zekî bi xwe jî bi mêvandari, riya xwe bi Swêdê xistiye. Du girgîrêkên kurd ku di teşkilata Osmaniyan de xwedî nav û deng in. Divê bê gotin ku ev herdû kurd li gor xwe planên wan jî bo doza kurdan jî hebûne.

Di derheqa vê berhemê de gelek tişt dikarin bîn gotin lê em dê kin

Sorgens och glädjens månad

Professorn Rohat Alakom har lämnat ett uttalande i detta avsnitt som rör kurderna i Irak och Kurdistan som ger en översikt över situationen i Kurdistan och Kurdistanerna.

Professorn Rohat Alakom har lämnat ett uttalande i detta avsnitt som rör kurderna i Irak och Kurdistan som ger en översikt över situationen i Kurdistan och Kurdistanerna.

Professorn Rohat Alakom har lämnat ett uttalande i detta avsnitt som rör kurderna i Irak och Kurdistan som ger en översikt över situationen i Kurdistan och Kurdistanerna.



Professorn Rohat Alakom har lämnat ett uttalande i detta avsnitt som rör kurderna i Irak och Kurdistan som ger en översikt över situationen i Kurdistan och Kurdistanerna.



Missionärer byggde bro till Kurdistan

Professorn Rohat Alakom har lämnat ett uttalande i detta avsnitt som rör kurderna i Irak och Kurdistan som ger en översikt över situationen i Kurdistan och Kurdistanerna.

Professorn Rohat Alakom har lämnat ett uttalande i detta avsnitt som rör kurderna i Irak och Kurdistan som ger en översikt över situationen i Kurdistan och Kurdistanerna.

Professorn Rohat Alakom har lämnat ett uttalande i detta avsnitt som rör kurderna i Irak och Kurdistan som ger en översikt över situationen i Kurdistan och Kurdistanerna.

Det glömda folket

Professorn Rohat Alakom har lämnat ett uttalande i detta avsnitt som rör kurderna i Irak och Kurdistan som ger en översikt över situationen i Kurdistan och Kurdistanerna.

Professorn Rohat Alakom har lämnat ett uttalande i detta avsnitt som rör kurderna i Irak och Kurdistan som ger en översikt över situationen i Kurdistan och Kurdistanerna.

Svensk-kurdiska kontakter under tusen år

Professorn Rohat Alakom har lämnat ett uttalande i detta avsnitt som rör kurderna i Irak och Kurdistan som ger en översikt över situationen i Kurdistan och Kurdistanerna.

bêjin. Ji bo nîfşên nû yên kurd, ne her bi tenê di bîranînek parçek ji dîroka kurd e, lêbelê nivîskar xwendevan teşwîk dike ku bi berhemên heja yên ku bûne stûnên edebiyata swêdî ji nasbike. Mina Selma Lagerlöf. August Strinberg. Gunnar Ekelöv ku hin motîvên berhemên xwe ji jiyana kurdan girtine. Ji bo kesên bixwazin li ser vê mijarê kurtir lêkolînê bikin, bi çavkanîyên ku Rohat Alakom berhevkerîye karê wan hêsantir dibe.


Heger em vegerin rexê swêdiyan, ji bêlî medya ku pesnê kitêbê didin, siyasetvan, palên çand, folklor û ilimdarên swêdî ji gotînen xwe teqşir nekirine. Anders Rydell ku di naskirindana vê pirtûkê de keda wî heye. wiha dibêjê: "Bêguman kitêb nîrxek dîrok û çanda dîrokîyê xwe heye, ji ber ku nivîskar ji perspektîvek kurdî û swêdî materyalê xwe bikar anîye. Lê ne ji bo vê taybetîyê tenê, ji bo tu para xwe ji tam, hêz û marîfeta nivîskar bigrê, gerek tu kitêbê bixwînî. Nivîskar carek din ruh dide girêdanên

di nav du gelan de. **Svensk-kurdiska kontakter under tusen år** di wateyê herî baş de, berhemek zanyariya gelêriye."


Profesor Olof G. Tandberg ku pêşgotin ji vê berhemê re lêkerîye dibêje: "... rêwîtiyek balkêş a dîrokê ye. Nivîskar bi neqşên nas û şelên sîpêhî xaliça zanyariyê ya swêdî-kurdî hunandî ye. Ev kitêb, ji tiştên pîranîyên me pê dizanîbû bêhîr, alîkariya me dike ku Kurdistan çiqas nêzîkî Swêdê ye."

Bêguman tespîta wezîra Swêdê, Ulrika Messing ya rewşê zanyariya li ser kurdan ji bo me giring e. Di axaftina xwe ya bi munasebeta civîna li ser kitêba Rohat Alakom wiha got: "Berî niha bi bist-sê salan meriv li Swêdê li kurdêkî nidikarî rast bihata..."

Ez bawerim ku naskirin û zanyariyek kur ji teref kurdan ji li ser Swêdê tunebû. Îro li Kitêbxana Kurdî li Stockholmê, bi forma xwe yek ji



Prof. Dr. Olof G. Tandberg, endamê Akademiya Swêdê ye. 1966-1970î de bi çend hevaldostên kurda ve komita kurdi-swêdî avakiriye.



Di civîna Pêşengeha kitêban a li Rinkebyê de, Olof G. Tandberg diyariyek da nivîskarê kitêbê, Rohat Alakom. Diyarîya wî ev mixê li jor e. Dema mix teslim kir wisa got: *Ma hûn dizanin ez çima dereng mame, ji ber ku ez li wî mixî digeriyan, lê dawî min ew dit û bi xwe ra anî da ku hûn pê tabûta kemalîzmê asêtir bikin. Fermo Rohat Alakom.*


wan kitêbxaneyên kurdî yê mezin e.) ez ji bona pêşengeha pêwendiyên swêdiyan û kurdan bejdar im. Helbet xalek ku em divê li berçav bigrin kitêba nû ya nivîskarê swêdî-kurd, Rohat Alakom a bi navê **Svensk-kurdiska kontakter under tusen år**. Peywendiyên ku piraniya me digotin qey tiştêkî nû ye, bi ser wê de ku ew peywendî nêzîkî hezarsalî çê bûne. ...

Her wiha li ser pêşniyara Olof G. Tandberg û pejirandina Ulrika Messing û gelek rewşenbirên swêdî ji bo **xelata August** ev kitêba Rohat Alakom wek namzet hatiye pêşniyar kirin. Ji bo kitêbek bo xelata August wek namzet bêt pêşniyar kirin, divê weşanxana ku kitêb weşandiye endamê Komela Weşangerên Swêdê be. Ji xwe piştî weşandina kitêbên bi swêdî, weşanxaneya Apec bûye endamê Svenska Förläggareförening (Komela Weşangerên Swêdî).

Helbet xwestina me xwendevanan ji ji Rohat Alakom wê hebe. Eger destpêkek hebe divê berdevamiya wê ji bê. Her çiqasî wê zortir be ji li dawiyê dê diyar bibe, ku "Ne Îsa swêdî ye û ne ji Muhamed kurd e".



Foto: Arif Zerevan



Mûrad gehişt miradê xwe

Heci Erdoğan

Ro hîn derneketi bû, devdevê sibe bû. Dol û zirnê destpekirin. Gundî hîn ti xewa kûr da bûn. Bi dengê dol û zirnê hemû millet ji xewê rabûn. Herkesî ji hev pirsikirin. Çi bû? Çima ew dol û zirne? Çima sibê zû?

Kesî ne zanibû ku bo çi dol zirne sibê yu ledikeve. Lê herkesî jî guman bi tiştêkî xweş tikir. Dol û zirne bo boşê lênakeve. Mihaqaq tiştêkî baş çêbibû. Lê disa jî millet ji hev pirs dikir. Çi bû?

Usê Kalê Şahmu taqriben 15 sal hebûn ew zevceî bû. Lê kurê Usê Kalê Şahmû ne dibûn. Bavê Usê herdem jî jîna wî Zêzê dixwest kurekî wan bibe. Lê jî alî xwedê de ti kurê wan nebû. Usê Kalê pir jî xizan bû. Şivanî û davî wî Şoforî dikir. Wek herkesî wî jî xwe ji bo ku here Almanyayê xwe nivisandibû.

Rojekê xeta wî jî bo çûna Almanyayê derket û çû Almanyayê. Lê li wê demê jî tu kurên wan nebûn. Usê Kalê pir bi henek bû. Digot jî rojan rojekê, mihaqaq kurekî min jî dê dibe. Lê min tu jî kesî ra xerawî nekir. Xwedê mihaqaq haşa haşa min jî bîrnake. Min bîr jî bike, ew jî wîdana xwedê ye.

Zêzê jî wekî mêrê xwe, Usê difikirî. Lê Zêzê pir aktif bû. Deçû ba Xoca û Milla. Bi dehan Nisqe ji Xocên Tirkan û ji Millên Kurdan berhev dikir. Zêzê guman dikir bi wî avayî Kurê xwe bibe. Zêzê neçûbû kêderê ku? Heci Bektaş, Ocaxê Tirkan û zaten Ocaxê Malê Home hero diçû. Cîranên Zêzê, bi Zêzê henek dikirin. Rojekê cîraneke wê li ber malê çend tiştên kevn berhev kirin û bi wan tiştan hatî ba Zêzê û jî Zêzê ra got: Aha wan tiştan min jî xocekî tirk girt, xoce got: Kê wa tiştan li duxînê xwe girêda kurê wê dê bibe. Zêzê bi wê pir xenê bû û ev tiştan girt û li duxînê xwe gireda. Zêzê tîm bawer dikir ku rokê kurekî wê mihaqaq were rûdinê. Wê rojê Zêzê pir dipa.

Gundê Çamalê (Çamalak) havînan sêrin dibû. Lê îro li derva germeke xweş hebû. Ruhê merî bi şenayî tîjî dibû. Îro, hertiş xweş bû. Ji bo çi ew xweşî, merî nedizanî bû. Dol û Zirne lédiket. Hemû jin, mêr, kal û kurikên Çamalê ji xewê rabûn. Zaten ew ji bo mangê û pezên xwe berdî çolê zû şîyar dibûn. Îro jî tengê zû rabibûn.

Mezinekî gund bi dengekî bilind, pirskir:

-Lo lo..., li wir çi dibe? Ew dol û Zirne ji bo ci ye? Kî dizewice? Sibê zû da hûn fedî nakin dol û Zirne lêdixin?

Ji jêr da cevaba wî hema hat.

-Lo Lo îro şenayî ye, şenayî! Kurekî Usê Kalê Şahmu bû! Te bihist. Kurekî Usê kalê Şahmu bûye.

Merî mezin li jor dîsa pirskir:

-Law kurê kerê, tu çima nabê ev Lawik e yan jî Keçik e? Law! Kurê kerê ew Lawikê ya jî Keçik e?

Dol û Zirne dastî bû. Mêrêkî ji jêrdê bang dikir, digot:

-Lawik e, Lawik.... Lawikî Usê Kalê Şahmu bû.

-Law Kurê kerê, tu çima nabê, çi nav lê danîn. Çi navvvvvv?....

-Lo... Lo Mûrad li danîn Mûrad! Ji bîst salan şûn de Lawikêkî Usê û Zêzê bû û navê wî jî Mûrad lê danîn. Mûraddddd..

Li gund herkes wek Lawikekî wan bûye, şa bûn. Zaten li gundê Çamalê dijminatî tune bû. Herkesî ji hev ra alikari dikir. Berî pence salî birayekî Usê Kalê bi xetayeke merik li gund kuştî bû. Lê wê malê dîzanî ku ew xetak bû. Dema Lavê Usê hatî bû dinê wê malê jî wek hemû merivên gundê Çamalê we ra şa bûn. Zate li gundê Çamalê pir kes jî xwenda bûn. Ew Xwendewan pir tişt li gundê Çamalê guhirandin. Alikarî pir û pir xurt bû. Gundê Tirkan jî bi bo vê, ji gundê Çamalê ra digotin gundê "Komunist" û "Kürtçü"

Mûrad li wî gundî mezin bû. Li wî gundî list û li wî gundî hevaltîya xwe zêde kir. Herkes bi Mûrad şa dibû. Mûrad ji bo hemû gundê Çamalê ra tişteke pir delal bû. Ji ber ku ev pir dereng hatibû rû dinê. Mûrad mezin bû û çû mektebê. Li mekteba pêşî mihelîmê wî jê ra digot: -Mûrad, tu delal î gundê Çamalê yî, lê bibe delalî gelî Kurd. Bibe delalî hemû insanan. Zekayê te pir pir e. Vê zekayê xwe qimmetê bidê.

Mûrad di mektebê da yekî pir bi zeka bû. Mûrad dema mekteba peşî xelas kir çû bajêr (Qirşehîrê) û li wir dest bi orteokulê kir. Lê Mektebê ji wî ra zahmet hat.

Li her alî Tirk û Kurmac û disa jî şerê nav wan. Kurên Tirka bang dikirin û digoten: "*Kılı Kürt osurdu duvara, duvar korktu, yerinden oldu. Yine kokudan kalan kiro Kürt oldu*" Ew şorên kurên Tirkan li ser kurên Kurdan bû. Ew salên 70 û destpêka salên 80 bû. Kurên Kurdan ji alî polisan û ji alî faşîstan tihatin girtin û bi destên wan yan dihatin kuştin û yan jî birindar dibûn. Piran ji wan kurên Kurdan di hapsa Tirkan da bûn. Kurên Kurdên Qirşehîrê jî ji wan bûn. Ew hertişt ji bo Mûrad problem bûn. Mûrad her tişt dixwest fêhm bike. Lê, wî tişteke fêhm nedikir. Çima hertişt ji bo Kurdan qedexe ye (yasax e)? Ziman, çand, dîrok û hwd. Mûrad ji Telebên gundê xwe yê li dibistanê mezin bûn, pirs dikir;

çima? Çima ev hertişt bo Kurdan qedexe ye?

Mûrad bi wan pirsan mezin bû. Lê ev pirsan tim û tim ji xwe ra dikir. Gundê Çamalê wek hemû gundên Kurdên Anatoliya Navîn, Kurd e. Meşqulatiya wan biçer, qamoyon û traktor in. Zewî li ba Kurdên Anatoliya Navîn pîr muhîm e. Ango ewan ne birçî ne, ne tazî ne. Rewşa wan a aborî baş e. Derdê wan tenê Kurdîtiya wan e. Ji bo wa ye Mûrad tim pîrsa Kurdîtiyê dikir.

Mûrad demeke Mekteba Lîsê xelas kir û kete îmtîhana Unîversîtê, herkesî bawer dikir Mûrad dê muhaqeq Unîversîteka mezin qezenç bike.

Dîsa havîn bû. Danê nîvro, germê gund diqwerand. Xoce ye gund ji germê ne dikarî here Camiyê û ezanê bixwîne. Xoce Tirk bû û digot: *“-Allah Kürtlere aci versin diye bu kavurucu sıcaklığında onların başına vermiş. Arada ezilen ben fakir kuluyum.”* Erê germê diqawrand. Lê herkesî kar dikir. Li ber her malê Çamalê patozkê kar dikir. Ji bo ga, mange û pezên xwe gundiyan sapê xwe dikir ka û kes. Andût û dirgen yek daçû jêr û yek daçû jor. Mam Usî malê Mamî Kasê bi dengê xwe yê xweş, kilamên Şivan Perwer digot. Dengê xwe geh zirav dikir wek keçikekê û geh qalîn dikir wek merêkî *“Destê xwe deste min de, keçîkê lê lê”*

Ez birçî me got Bakoyê malî Hacîyê Kesê, wan jinan temel

wîcdan tunene. Çi bû nane ma nîvro? Mûrad pîr eîn dibû. Alike Bako û alî din Mamus û Merîyên din. Hemû tewra kar dikirin û henek ji kê m nedabûn. Mûrad ji tişteki tenê heznedikir. Ew ji fiqreyê li ser jinan tê gotin. Mamus tim digot: -Mûrad le wer qahir dibû. Lê disan ji tişteki nedigot. Dema Bako bo derengketîna nanê nîvro qahir bû, ji jêr da dîya Mûrad bi dengê xwe yê qalîn bang dikir: -Mûrad... Mûrad Nama te ya ji bo unîversîtê hat. Min vekir, mîzgînî ji te ra, mîzgînî ji te ra, te unîversîta li Anqara Hacetepê qezanç kîrî. Him ji faqûltey ya Hekîmî.

Erê, Mûrad bi vî xeberî dişa bû. Wî dizanibû, ku li unîversîtê merîv pîr tiştan hîn dibe. Wî dixwest li ser dîroka Kurda, bi taybatî dîroka Kurdên Anatoliya Navîn bisekine. Bê ka bi çi awayî ew ji Kurdîstanê derketina û bo çi hatine Anatoliya Navîn. Qederê Kurda tim yek e? Qederê wan li herdarê yek e? Bo çi ew Milletek e ku zêdeyî 40 milyoni ye, hîn ji bindest in? Ew pirsana dikir Mûrad ji xwe ra. Ango unîversîtê ji bo wî şanseke mezin e. Mûrad bi wê awayê bi qezançkirina unîversîtê şa dibû.

Havînê Mûrad dest bi unîversîtê kir. Semesterê yekemîn wî çend hevalen xwe ji alî Kurdîstane peyda kir. Ewan ji li ser pîrsa Kurdîti disekenîn. Ji Mûrad ra ew pirsan tişteke pîr xweyî bû. Lewra zûda wî dixwest li ser wê pîrsê bisekine û gelê Kurdîstanê ji nezîkî nasbike. Li

we demaye Mûrad ji hevalekî xwe ji Amadê xeberekî ne xweş bîst.


Hevalê Murad ji Amadê got: Mûrad te bihist hemşerikî te li Kurdîstaêe şehît ket. Navê wî Ali Murt e. Tu wî nas dikî? Mûrad nikarî pêşî tiştêkî bêje. Soluxa Mûrad teng bû. Ji çavên wî çend hesrîk ketin. Ali ji gundê Araplî bû. Hevalê Mûrad bû. Ew jî li ser pîrsa Kurdan pir disekinî û Mûrad ji wî pir tişt hîn bûbû. Mûrad û Ali bi hewra pir jiyabûn û hewra top dîlistîn û bi hewra aşîq bûn. Lê Ali digot hevalê Mûrad, hevalê Mûrad; ango merivê bi namûs û şeref li ser derdê Kurdan mecburba bisikine û bo wê karbike. Merivê wê nakin, ne merivên entellektüel, sosyalîst û hele ev Kurdên xarê, ji kurdîtiya wan şûphe dikim. Mûrad hemû tiştan ji Ali ewîsbû. Lê Ali niha tune. Ali şehît bûbû. Şehît bûna Ali li ser Mûrad tiştêkî pir kûr û giran peyda kir. Mûrad wê demê qarera xwe da. Ji hevalên xwe ra got; ez herime çiya. Bima gerîla.

Erê Mûrad qarar da bû. Çû teva gerîla bû û peşî li Çukurova bû berpîrsiyar. Hukumata Tirk li her alî li Mûrad digerî. Resimên wî li heralî Turkiya hatin belavkirin. Ew ji Tirkan ra “terorîst”ke mezin bû. Lê Mûrad dîsa jî netirsî. Li ser malbata wî lêdan û îşkenceyên hukumata Tirk herdem zêde dibû. Lê dîsa jî Mûrad şer dikir. Di telefon û namên xwe da ji hevalên xwe re digot, ez

şerê xwe tenê bo gelê Kurd nakim, ango şerê me bo serkeftîna û azadiya gelê bindest li Rojhilata Navîn e.

Mûrad li Çukurova nikar bû bisekine. Her re jî wî ra teng bûn. Wî tek çare çûna ser çiya didît. Mûrad çû çiyayên Kurdîstanê. Ji çiyayên Kurdîstanê ber xwar, awa sar û cemidî wexwar. Nanê malên gundiyanê Kurdîstanê xwar. Wî kaniya Kurdan, yanî dayka Kurdan, Kurdîstan nas kir. Kurdîstan ji wî re pir xweş hat. Wek hemêza daykê bû. Bîna Kurdîstanê wek bîna daykê, wek bîna xangê, bira bû. Kurdîstan ji wî re şîrîn bû. Ew şîrîniya pir û pir kûr û mezin bû. Ez ji bo azadiya vê şîrîniyê şer dikim, digot Mûrad.

Zivistan bû. Mûrad û hevalên wî gerîla diçûn çiyayê Hasenkeyf. Lê leşkerên Tirk pûsû çekiribûn. Mûrad û hevalên wî pûsûya dijmin pir dereng farq kirin. Lê dîsa jî gerilayên Kurd û Mûrad li hemper leşker pes nekirin. Mûrad û çend hevalên wî şehît ketin. Mûrad yanî bi navê wî li cem gerîla QAZÎ birindar bû. Digot bijî Kurdîstan û bijî Azadî. Mûrad şehît bû. Lê li ser mala wî û gundê wî şefqa Azadîyê dipirîqe. Bijî Mûrad(Qazî), bijî dayka ku tu hanî rû dinê.



Kurtejiyana min

Bekir Darî

Ez kerekî 20 salî me. Min mektep û medresa Hakîm Kera xelaskir. Dayka min kerjineka pir menşûr bû. Nav û şana wayê li heft gunda dihat qalkirin. Bi rindî û jîranî, ez ji wê nekêmtir im. Bavkerî xwe nasnakime, ema gilî û gotinên dayka min eger rast bin, ew kermêrekî pir xuwarde, cavlider, serxoş û berdoş biye. Belê, ez naxwazim heqê wî bixwum, kermêrekî pir egît biye.

Lê, ez bi rindî û hunera xwe va mîna dayka xwe me. Ez pir rind im, ji bo wê ciwankerê gund, û xortên gund çavên wan li deriya rêya min in. Di rindiya min de para xalkera jî heye. De tu were, kû ji min ra zahmetekî pir giran e, zilm û zoriya li ser milê min qat bi qat pir dike. Edî taqeta min nemaye. Daxwaziya min, xelasbûn û jiyaneke azad e. Armanca min rizgariya kera ye.

Belê rojekê min qerar da, ku ez bi kijan rê da herim, ku ez azad bim! Yan jî xeta û kêmaniyên min çi ne? Ji bo çi va zilma ji min ra musteheq e?


Wayî qungirî ziktûr xwadiyê min e (Ji bo çi xwadiyê min e, ez nizanim). Xudêy li jor e, ew sedûpênce kilo heye, rêya me jî hîn dûr e, hetanî mal pênc km ye. Derman di çokên min da nemaye, ema mecbur im.



Em gavekê di ber we geştinî mal. Baweriya min ew bû, ku ew dê bibêjin, va xizana westiyaye di siyê gomê da, tenik yêm û aw bi bervedin maistirhet ke.

Mîna ku hun dibînin ve carê jî nowba lawkê wayî ye. Turekî tijî genim, lawik, û çalê yonce jî avêtine ser min, em ê terinî êş. Rêya me dûr ê, û pir wêz hene, Xudêy namusa min biparêze, quweteka mezin bi min de.





Bi rêya êş da tiştên ku hati serê min, ne hûn pirskin û ne jî ez bibêjim.

-Wa veng nabe! Ji bo çi wa zordestî? Qebebet û kêmayiyên min çi ne? Ew mahluqatê di xwadiyê çi keremeta ne ku ewana heyataka têr û serfîraz heq kirine?

Ma kêmayiya min ziman e?


-Zirr-Zirrê bêtir tiştî nizamim, ema zimanê pêz ne zimanekî qelew e. Ewna jî ji me -me, manga mu-mu, çuçik wit-wit û hespa jî hî-hî dibên.

Na! va zilma ne ji bo ziman e.



Rindî û keleşî tu kêmayiyên min tunene. Li wan çawan, mîna moriyên kehrîbar in. Li wî dêmî, û guhîyên min şekil baş û poz û devê min î narîn û rindik.

Serfirazî
wa ye?



Min biryar da ku ez birevim, herim. Û ez bi tenê derketim rê.
Pir çûm, hendik çûm. Yekcaran giyayê nû avêt navbera
diranên xwe. Ji kaniyên ava xweş, av wexwar. Paşê evar bû.
Herder reş bû, tirs kete dilê min.

Serfirazî wa ye?


Gur hate bîra min. Xewa min reviya û ez di bin xûyê da
mam, paşê getiliyam di bin stêrka da tir tîr heziyam.


Devdeva sibê da tirs êdî qediya û xew kete çavên min. Min
xwe di taliyekê da dirêj kir. Min li dor û aliyê xwe nêrî ku êdî
rakevim

-Lawo, ew ne gur e?

Xudê bela xwe bi seriyê wî de qawlê wa yî ne rind in. Çare
nema, ez reviyam û gur da dû min. Adet û bastani ya min jî
ne sebabe, koletiyê ne. Ez kerqîzeka pir paqij û hêja me.

Hun jî çî xwendevanên pir
qeleş in. Çima nabêjin darek
li ber te ye, loo.





Tu kereka cengawer î.
 Di qederê da va jî hebûye.
 Ez jî gur wan xelashûm, û
 hişê min giran giran hatiye

seriyê min.
 Ez, tot, û qird (meymûn)
 disa derketin rê...

ÇARÎN JI HÊLÊ SARIZ Ê

Berhevkar:
Mehmet Bayrak

Lawko lawkî Sinemîlî
Tu mesekine la wî tîlî
Ku hindik hari, ku pir hari
Tu dayaxê dilî kulî

Çavê reş in hawe turu
Haw jî hawe radebirî
Ku pir hari, ku hindik hari
Ez jî dardê te demirim

Dilê min baxê samsun e
Giredan balyê tutun e
Pir silavê jî mi da lêkin
Lê kaçkê kidik e, lê Xatûn e

Çavê reş in hawe turu
Haw jî hawê radebirî
Lê rindê hata ku te hilgirim
Genca min û te radebirî

Em herdu ne, em herdu ne
Le ser kanyê ortê dine
Ku te nego ku mi nego
Ke haje çê k'em herdu ne

K'em be heva tew dudu ne
K'em kulilkên ortê dine
Ku te nego ku min nego
Ke(h) haje çî k'em herdu ne

Dallikawak pir be av e
Be qunduron xwe de nav e
Ezî jî kesi ra nawêm
Dilê min katye bancê zirave

www.kurdishakurdi.org

Çiyan jê çiyan bilintir in
Gul jê sosinan bebintir in
Kî çi debê bira biwê
Dost jê yaren şîrîntir in

Dilê min û te dudu ne
Kavri ziyaretê avê xwe î le bin e
Ku tiştêk hate serî te
Tu bizan ku ji nîfirê min e

Ava sarê tu ja ku tê
Ja ber konya berbesu tê
Wa ja kujan êle bistê
Ku yar la yarê xwe sutê

Lo lawiko neyi je viro
Neynika min hilgirt biro
Neynikê min dedi bide
Ne dil mayne ne xatiro

Çavê reş le mi lalondin
Pî-bazik le mi xelandin
Ne hilgirtim, ne revandim
Di arê dil da şevandim

Avê sar e tê be kuda
Aralixê berfê kevn û nûda
Ku meryan yarine taze girtin
E kewn le meryan sute

Mi nizanî, mi nizanî
Mi le şunê cile kursî danî
Tu rindake pîrî rind bû
Mi qiymeta te nizanî

Lê keçikê jê Dadalaran
Xîlik daye ber kemeran
Tu wa min da sing û baran
K'ez be tedim keskî paran

Cundi hona gundi me ye
Kê ku tunî sed xane ye
Ku hindik herî, ku pir herî
Çavê minî lê reyê te ye

Lê ser sulum e, lê ser sulum e
Berê xwe daye Erzulum e
Çûyîn a ku ezî terim
Negot ku be xatirî te zalim e

Dilî min le dilî te da
Tu yazmişke li guçkî xetê
Tu bizana ku serî minî letenge ye
Tu nasakinî be xwe tê

Baran barî tene tene
Vana rêçên min û te ne
Destî xwe de destî min ke
E qala min û te dekinê

Baran barî erdê şil kir
Nav k'alamon çijî gul kir
Tu rindeka pira rind bû
Te kezewa min çijî kul kir

Wî wî wî le wê ma
Dake dayê le brê ma
Îşê mey ki buyî çûyî
Huro dîsa le xadê ma

Wî wî wî tu wer meke
Dilî mî jî xwe sar meke
Ucê orgone rake min di binke
Ku min çirkir tu deyn(deng) meke

Hêlê malan frêz e,
Bini malan frêz e
Gur hatiye nav pêz e
Derpi Donke atlas e
Aylaz e ki bolmaz e
Sadiq e ki qurnaz e
Tosun e ki yongaz e
Ha leyli, ha leyli...

Çarînên Kemanî

Baran barî tav be tav e
Kesk û sur xwe avite have
Were ku em herine...

Baran barî av şeli bû
Yar li bengê xwe beli bû

Baran barî ewr gurmujî
Barîn barî toli toli

“Deweboyu” berwe min te
Filorê findiq ning dekute...

Çavkani: *Zeynep Fatma Bayrak*

ZÎLANIM

(Yılların birikimi)

Helin Gorkü

Zilan'ım ben
Kaç zaman geldi geçti
Kimseler duymadı beni
Ne tarih sayfaları
Ne de kodes şiirleri
Ve, ne de kapitalin kabarık sayfaları
Yazmadı beni
Ama ben Zilan'ım
Unutulmuş kızıl zamanda doğdum
Bir parça İsa gibi
Bir tanrı lütfu babasızım
Dahası Meryemsiz sabaha güldüm
Gülüşüm gözsüz
Ağlayışım sessiz
Çünkü güneşsiz gördüm gökyüzünü
Mezalimle anılır mazim
Onur adına
Özgürlük aşkı için
İki telli, iki sesli bir türküdür
İlk merhabam
Makineli tüfek tıkırtısına
Aşktan yana döl tutar bedenim
Ama ben Zilan'ım
Ne duyanım var
Ne de yazanım
Naciz düşmüş bedenimde
Zülmün kılıcı ebe olur
Adı isyan doğmuş bebeme
İsyanı umut
Ve yatağım
O unutulmaz zamanda
O kızıl sabahta
O inleyen gecede
Mezalaşır umuda
Ve zülmün türküsü

Eteklerimde taşlaşmış çocuk çığğdır
Ama ben Zilan'ım
Bir ben kaldım geriye
Kaç kuşaktır beklerim
Sözüm var
Bro Heski'ye, İhsan Nuri'ye, Dersimi'ye
Mahşeri düş cyledim
İntikamı sevda
Çünkü ben Zilan'ım
Kuytu derelerde
Dağ eteklerinde
Karanlık boğazlarda
Yarım kalmış merhabam
Anasız ve babasız kalmış
Adı isyan evladım
Kendi kanımda boğulmuş nefesim
Ama ben Zilan'ım
Alınmamış intikamım
Ve muhayyelli meftunu
Boynuna irmik gibi ördüler
Beyaz yollarda
Matemli marşların yürüdüğü gecede
Şeytanın tenceresini kaynattılar yüreğimde
Ondandır
Ateş kuyusu Etna'dır yüreğim
Sessizdir ağlayışım
Sessizdir intikamım
Ama ben Zilan'ım
Ocaklarda tavladım şimşegi
Kızgınlaşmış kor gibi
Bir ölüm vakti çıktım
İnkâr karabasanında
Sessizliğe ses oldum
İki kelimedede
Artık yüreğim deniz

Dilim dalgadır
Mankurtlaşmış beyinlere aşık oldum
Kavgalaşan Serok'ta
İki sözcükte
İlk adımda
Yoluma dikildi
Keklik onursuzluğu
Ve ben
Işığın kaldım mankurta
Dört duvar
Demir parmaklık
Ve volkan zincirleri
Hazırlandı
Kaç asır sonra
Promethus yine vurulacaktı zincire
Tanrı Zeus'ta cunta
Ama ben Zilan'ım
Üç kibrit çöpünde
Granitten inaçtum
Vahşetin zindan kuyusunda
Yıldızların buz yağdığı aysız gecede
Dört alev oldum dört beden'de
Beni bekler Semalar
Kanatlarımda cennet
Şahinin dağları Eruh'ta
Dört canım kül olmuş
Bedenlerinde doğdum
Çünkü ben Zilan'ım
Zümrü-ü Anka'yım
Dirhem dirhem eridim
Damla damla akıttım toprağa
Kemiklerimi, borçlu giden
Kıpkızıl kanımı
Yaşamı uğruna ölecek kadar seven
Verdi bana
Ve iliklerimi
Aç
Kupkuru
Ama tutku deryası
Dört bedende mayalandım

Zilan'ım ben
Bilirim yaşamayı
Ama!
Tanrı lütfu
Siyasetin pişpiriği
Buyrulmuş ıslahat fermanı
Yasakmış bana ondandır
Gülüşüm sessiz
Sevmelerim sessiz
Ve de isyanım sessizdir benim
Ama ben Zilan'ım
Enel Hak-ı
Kamil-i insanı okudum
Elimde topuzumla
Yeni insanı arayan
Dervişiyim Kürdistan'ın
Ve işte
Dersimdir yeni mekanım
Güneşi avuçladım orada
Sessiz intikamı
Mankurta ışık çalmış beyni
Granit kayası inancı
Cennet kanatlı şahini
Ve eridikçe çelikleşen kemikleri
Kızılbaşan kamı
Birleştirdim genç kız bedenimde
Bilesiniz
Can çıkmaz bedenimden
Bir kolumda Besé
Diğerinde Beritan'la
Yürüdüm üstüne ölümün
Ölüm anafor gibi obur
Ölüm soğuk
Ölüm doğmak
Ölümde yaşamak gerekir dedi tarih
Ve işte o vakit
Bombalaşır bedenim
İki sesli değil
Milyon sesli türküdür artık
YAŞAMA MERHABA.

KEÇİK DİL E

Keçik dil e
Dil evîn e
Dilê zozana
Dilê havîna

Keçik dil e
Dil berf e
Dil baran e
Dil brûsk e

Keçik dil e
Dil dost e
Dil yar e
Dil par pî par e

Keçik dil e
Dil şewitî
Dil peritî
Dil şikestî

Keçik dil e
Dil bihar e
Dil dinale
Dilo menale

Keçik dil e
Dil ziman e
Ziman dibêje
Dil keçik e

Keçik dil e
Dil hewal e
Dil bermalî ye
Dil jîyan e

Keçik dil e
Dil hêsirk e
Hêsirk baran e

Keçik digiriya
Bi her du çavane

Keçik dil e
Dil har e
Dil nar e
Hetak keçik nere

Keçik dil e
Dil gul e
Dil nergiz e
Dil herdem bi zîz e

Keçik dil e
Dil dûr e
Dil kûr e
Dil tim bi sor e

Keçik dil e
Dil qeder e
Dil felek e
Felek xayîn e

Keçik dil e
Dil lawik e
Lawik dilopek baran e
Dibare bi ser lêvên keçikê de

Keçik dil e
Dil hêvî ye
Hêvî dûr e
Keçik dûr e

Keçik dil e
Dil ez im
Ez dilopek baran im.

Hayrettin Güven

KEÇKA MIN BERXA MIN

Keçka min, berxa min
Bixwîne binivîsîne
Bixwîne bewisa
Dijminan nasbîke
Berxa min, keçka min

Keçka min, berxa min
Ji çûkên xwe hesbîke
Mezinên xwe qet ji bîr meke
Li şorê wan guhdar bibe
Berxa min keçka min

Keçka min, berxa min
Ji welêt hes bike
Xayînen welêt ji bîr meke
Şervanan di dilê xwe de veşêrke
Berxa min, keçka min

Keçka min, berxa min
Ziman qet ji bîr meke
Jiyane qet bermede
Dibare zulum bi ser me da
Berxa min keçka min

Keçka min, berxa min
Ji insanen hesbîke
Ji xwendevanan pirs bike
Doza xwe tu caran bermede
Berxa min, keçka min

Keçka min, berxa min
Bi evindaran re heval bibe
Bi dildaran re tev bibe
Ji dilê xwe re bermal bibe
Berxa min, keçka min.

Kayrettin Güven

XEBEREK

Li serî çiya gulekê vekirî
Bi ser çolan da baranek barî
Şervanên li dûr ve arek vexistî
Xeber hat go; xortekî ji keçikekê heskirî.

Li ber bêrî berxek bi tenê mayî
Li ber malê lorîkek digirî
Li dûr ve arê şervanan vemirî
Xeber hat go; keçikek li xortekî siva hatî

Behra Wanê bîstî, ava xwe miçiqî
Newala Firatê bîstî, berê xwe çerx kirî
Bilbilê bîstî deng jê derneketî
Xeber hat go; lawîk bi dilê keçikê mirî

Ji gundan pirs kirine, gotine;
ma we nedî
Ji karwanan pirs kirine, gotine;
ma we ne bîstî
Ji riyedara pirs kirina, gotine;
em tê negêştinî
Xeber hat ku keçikê gotî;
binê erdê ji serê erdê baştirî

Gotin evindara di xewnê de ditî;
her derekê her berekê bîstî
Dildara di dilê xwe de veşartî
Xeber hat go Xudê keçikek da wî lawikî.

Kayrettin Güven

YÜREK YARASI

Yüreğimin yarasına konmuş bir bülbül
Gece gündüz öter cik cik de cik cik
Yarin yokluğunda ruhum daralmış
Gece gündüz söyler çık git de çık git

Çıkıp gitsem de yare karşı
Ruhum bir anlamaz fırtınaya karşı
Koparmadan yüreğime ektiğin o çiçeği
Gel güzelim gel al bendeki bu aşkı

Genliğim dağlarda çatmış tüfek
Tufeğimin namlusunda açmış bir çiçek
Gelmış oturmuş yarin hasreti
Laftan da anlamıyor diyor gidek te gidek

Gidek yarin yollarını sürek
O bize gelmese de biz ona gidek
Diyorlar yarin tutturmuş bir naz
Dedim asil yarimde güzeldir bin naz

Yarin gözlerinde gençliğim biterken
Kırpiklerinden umutlarım düşerken
Yine de bir tel saçına tutunmuşum
Hayatın tüm akıntılarıyla boğuşurken

Gözbebeklerinde yarin esir alınmışım
Bir o hücreye bir bu hücreye konulmuşum
Ruhumun denizinde fırtınalar estirirken
Ben bir anlamsız sözüne vurulmuşum.

Yar için eşten dostan geçmişim
Ayrılığa ölüm kefenini biçmişim
Yarin elinden sunulan zehiri
Bal şerbet sanıp içmişim.

Nayrettin Güven

EZ TÎORA NÊ XI RA KARAVIYENÛ


Ez tîora nêkaraviyenû
tenebiyîş tê xira karaviyenû
Yo ki tîo piynî di verda ne ez bûn,
umûdê mi bi
Ez bêumûdbiyîş tê xi ra karaviyenû...

Tî ya îro biê
Siwa şîorê
Tî ki şîa
Piydê xi di namê xi nîê,
tenê decî verduna...
Ez tîora nê,
dec dê xi ra karaviyenû...

Kiyki ti amîya wi
Tîo xi di şahî ardi wi
Tî ?îa, şahî zî tîo di şî
Ez tîo ra nîê,
hersûnê çimûndê xi ra karaviyenû...

Tî kiynê şarî ya
Roşn nîê tarî ya
Tîo xi mi ra qarîya
Ez tîo ra nîê,
xi ra karaviyenû...

Nêçîrvan Qîlorî



Ji kovara henek û yariyan
Pîneyê
 Kürtçe Cep Sözlüğü
 Ferhengoka bi Kurdî
 Kurdî-Tirkî



Hun dikarin
 kovarê û
 ferhengokê
 ji adresa jêrîn
 bixwazin.

Edresa xwestinê:
 İstiklal Caddesi,
 Ayhan Işık Sokak,
 23/3 Beyoğlu-
 İstanbul

Faks:
 0 (212) 251 95 85

E-mail:
 info@welat.com

GOTINÊN MEZINA

Berhevkar: Temelî

A

- ☞ Ap pismam e, xal xwarzê ye.
- ☞ Aşda di heri, ding genim di kuti.
- ☞ Aqil, dijmin e, ne zanîne ye.
- ☞ Aqilbend tim mezini ye.
- ☞ Aqil kemî rê li ber meriyan wenda dike.
- ☞ Aqil bi peran nêkirîn.
- ☞ Aqil bi kovike ne kirin seri.
- ☞ Agir şunê ku ketiyê dişewtîne.
- ☞ Agirî sor bextê ronî ye.
- ☞ Aşê xwari êrd diheri.
- ☞ Ava ruyan revîye.
- ☞ Ardê xwe bêjing kir, bejinga xwe bi darda kir.
- ☞ Aqil sivikî bar giranî ye.
- ☞ Av li êr ne kirin.
- ☞ Ardê xwe bit kepaka xwe rit.
- ☞ Anê, ewna çuyîne tuye terî, tu çima kun bi xwe ra dibi.
- ☞ Alko malê bi teva ye.
- ☞ Agirê bi duyî aşkere ye.
- ☞ Arê ardêyê, ava him dayik e, him bav e.
- ☞ Agirî sor kesî naşewtîne.
- ☞ Ardî malê mede ber bê.
- ☞ Ava zêlal jina delal.
- ☞ Av xwîne dişo, xwîn xwîne naşo.
- ☞ Ap li birêz, xal li xwarzê xwey dike.
- ☞ Ar ekî sor e.
- ☞ Ar î dorê xwe ronî dike.
- ☞ Areki ku sor e, pak û şîr e.

B

- ☞ Birnê giran derdê seran.
- ☞ Berê di pêşîrê xwe ra bigire.
- ☞ Bextî meriyanî di destî xwe da ye.
- ☞ Birinê kêrê çê dibe ê zimên çê nabe!

- ٧ Bayî jêrî lê xistiye.
 ٨ Bexî çê li ber kozê aşkere dibe.
 ٩ Ba şunê te li her derê hebe.
 ١٠ Bûkê zarî û ziman tune, xwesiyê dîn û îman tune.
 ١١ Berf li çiyê bari.
 ١٢ Bex î ku bi beran be, li ber kozê belî dibe.
 ١٣ Bê heval, bi rê nekevin.
 ١٤ Bexî nêr bo kêrê ye.
 ١٥ Bayî jêr lê têxe
 ١٦ Bizinê ji miyê ra got; min ewa te dît.
 ١٧ Bûyê bijêrka ser sêlê.
 ١٨ Bi testekî du kar ne kirin.
 ١٩ Berve gur ne zirin.
 ٢٠ Berî baranê ba ye, berî mirinê ta ye.
 ٢١ Barî giran para kera ne.
 ٢٢ Bi zikî birçî nê listin.
 ٢٣ Bi kevîrî sivik herkes xwe dimalêşe
 ٢٤ Bi çirtkê li derî xelkê mêxe!
 ٢٥ Ba şîrî xirab nekeve para kesî!
 ٢٦ Bermal xwedana malê ye!
 ٢٧ Beranî stewr li xwe nîne.
 ٢٨ Berjêrî tuke rune, berjur tuke simêl in.
 ٢٩ Bûye çoyê dest dînan.
 ٣٠ Bi benî dijmin ne daketin bîrê.
 ٣١ Bi navranê xwe pît be!
 ٣٢ Berike kune zikî birçî ye.
 ٣٣ Berî malê cîran hilgire.
 ٣٤ Bi çavên birçî zik têr nabe.
 ٣٥ Birayî min î mezin li pêyê min xist
 ٣٦ Birayê min î biçûk li pî min xist.
 ٣٧ Ba merî bê text be, lê ma bêbext nebe!
 ٣٨ Bextî reş meriyan ber nade.
 ٣٩ Buxtan teniya bin tevê ye.
 ٤٠ Bi guviştinê şîr nê der.
 ٤١ Bûkê bi bext xwedan text e.
 ٤٢ Bê himi tunebûn e.
 ٤٣ Bivirî te hênî di goncda ye.
 ٤٤ Bê aqilî kurîya girê mezin e.
 ٤٥ Bizinê kulek tim ê çilek e.
 ٤٦ Bi beçiyek pirtan nê bûyîn mêr.

Aksaray Dımılicesi

(Dımılice-Türkçe Sözlük)

Hazırlayan: *Memê Hilkeçikî*

Kısaltmalar:

L.	Fiil
m.	Dişi
n.	Eril
N.	İsim
Rbd.	Sıfat
Rgb	Zarf

Q

qala pîyêni N. yerme, küfür.
qala pîyêni kerdiş L. küfür etmek, yermek.
qaldûn rgp. söyleyiş sekli, telaffuz.
qali N. 1. söz, laf. 2. kelime.
qalik N. (ağaç) kabuğu.
1 qalin N. başlık, kaim.
2 qalin rgd. kalın.
qalin biyîş L. kalınlaşmak.
qalin kerdiş L. kalınlaştırmak.
qalinî N. kalınlık.
qaliw N. kalıp.
qaliwê sawûnî N. sabun, sabun kalıbı.
qalî biyîş L. 1. bahsedilmek. 2. konuşulmak.
qalî kerdiş L. 1. konuşmak. 2. bahs etmek.
qalûçi N. (ayak) parmak.
qam û qerete N. boy pos.
qama N. kama.
qama tira kerdiş L. kamalamak, bıçaklamak.
qamçî N. kırbaç.
qamçî kerdiş L. kırbaçlamak.
qami N. boy.
qami dayîş L. boy vermek, uzamak.
qamyoni N. kamyon.
qantîr N. n. katır.
qantîri N. m. katır.
qanûni N. m. kanun.
qariyayîş L. kıskanmak.
qas rgp. kadar.

qas kerdiş L. eşitlemek, eşit hale getirmek.
qasoki rgp. ... olduğu zaman, ... olur olmaz ...
qasta rgd. 1. yalandan. 2. yalan.
qasta kerdiş L. 1. yalandan yapmak. 2. şaka yapmak.
qasta vatiş L. yalandan söylemek.
qastikiên rgd. 1. sahte. 2. yalancı, yalandan.
qaşik N. n. meyve kabuğu.
qat N. n. kat, tabaka.
qatêki N. 1. bir takım (elbise). 2. bir apartman dairesi.
qatix N. n. yoğurt.
qaz N. (hava)gazı.
qe rgp. asla, katiyyen.
qe çiêki rgp. hiç bir şey.
qe niêwo rgp. hiç olmazsa.
qebile N. kabile.
qedîm N. keser.
qefeliyayîş L. üşümek.
qefelnayîş L. üşütmek.
1 qela N. kale.
2 qela N. m. karga.
1 qelb N. kalp.
2 qelb N. kustumuk.
qelbetûn rgp. yığınla, bir sürü.
qeldapî rgd. tersyüz
qeldayîş L. 1. devirmek. 2. çevirmek.

qelefet N. boy pos, dış görünüş.
qelemi N. m. kalem.
qeleşiyayîş L. yanılmak.
qeleşnayîş L. yarmak.
qelew rgd. n. şişman.
qelewi rgd. m. şişman
qelew biyîş L. şişmanlamak.
qelew kerdiş L. şişmanlatmak.
qelewî N. şişmanlık.
qelfe N. 1. kafile. 2. grup.
qellewnayîş L. kusmak.
1 qer rgd. esmer.
2 qer N. kahr.
qerar N. karar.
*** biêqerar** kararsız.
qerar dayîş L. karar vermek.
qerar girîotîş L. karar almak.
qeremet N. iftira.
qeremiyayîş N. uyuşmak.
qeremûn rgd. n. kahraman.
qeremûni rgd. m. kahraman.
qeremûni N. kahramanlık.
qeresiyayîş L. aşırı susamak.
qerez rgp. garaz, kin.
qesiyayîş L. (süt) ekşimek.
qesnayîş L. (süt) ekşitmek.
qet î qût rgp. yırtık pırtık.
qewaxi N. kavak.
qewe N. kahfe.
qeweriyayîş L. kovulmak.
qewernayîş L. kovmak.
qewil biyîş L. kabul edilmek.
qewil kerdiş L. kabul etmek.
1 qêy rgp. 1. tabî, elbette.
2. herhalde, anlaşılan.
2 qêy rgp. için.
qêy çi rgd. niçin.
qêy vinna rgp. sanki.
qêyde N. 1. makam, hava.
2. usul, biçim, şekil.
qêyme rgp. (yokuş) yukarı.
qêymê (koyî) kerdiş L. mec.
şaşırmak, delirmek.

qêyş N. kemer, kayış.
qêyt N. eşya, malzeme.
qêyt kerdiş L. hazırlamak.
qêyte biyîş L. göz kulal olmak.
qeytkerde rgp. hazır.
qeza N. kaza.
qeza kerdiş L. kaza geçirmek.
qezete N. gazete.
qible N. kible.
qic rgd. n. küçük.
qic kerdiş L. küçültmek.
qicek rgd. n. ufaklık.
qiceki rgd. m. ufaklık.
qici rgd. m. küçük.
qici N. küçüklük.
qida biyîş L. kurban olmak. * **ezê**
qidê tîo wî sana kurban olurum.
qida kerdiş L. kurban etmek.
qidênayîş L. bitirmek.
qidiyayîş L. bitmek.
qijile N. tolu.
qilênayîş L. 1. kavurmak.
2. kızartmak.
qilêneki N. kavurga.
qiliçiki N. çalı çırpı, dal budak.
qiliyayîş L. kavrulmak. * **wa rin**
biqilio iyi kavrulsun.
qimiliyayîş L. (kumaşın) hafif
yanması.
qinidaye N. n. homo.
qinnê derzenî N. igne deliği.
qinni N. m. göt, kıç, anus.
qir kerdiş L. katliam yapmak.
qirç qirç kerdiş L. gıcırdamak.
qirçiki N. boğaz.
qircile N. tolu.
qirçnayîş L. gıcırdatmak.
qirfi N. alay.
qirfi kerdiş L. alay etmek.
qirme N. tüfek.
qirriki N. boğaz.
qirş N. dal, dalcık.
qirşiki N. dal budak, çer çöp.

qiteqit rgp. tam tamına, ucu ucuna.
qiylik dayış L. aşırı acıkmak.
qiymet N. kıymet.
qiymet dayış L. kıymet vermek.
qiymet zûnayış L. kıymet(ini) bilmek.
qiyr N. katran.
qiyr biyış L. katran gibi kararmak.
qiyrayış L. bağırmaq.
qiyrnayış L. bağirtmak.
qizilbaş N. alevi, kızılbaş.
qıjayış L. bağırmaq, çığlık atmak.
qıjî N. çığlık.
qıjnayış L. bağirtmak, çığlık attirtmak.
qım kerdış L. yetmek.
qol rgd. kısa, bodur, tıknaz.
qoline N. omuz arası.
qominîst N. n. komünist.
qominîstî N. m. komünist.
qor N. dizi, sıra.
qor biyış L. sıralanmak, dizilmek.
qor kerdış L. sıralamak, dizmek.
qorik N. kalça.
qot rgd. başı açık.
qotik N. zıkkım.* **Qotik bûori!**
Zıkkım yiyesice!
qoxe N. kavga.
qoxe kerdış L. dövüşmek.
qûçi N. m. yığın.
qûçi biyış L. yığılmak, birikmek, toplanmak.
qûçi kerdış L. yığmak, biriktirmek.
qûlli N. m. delik.
qûlli akerdış L. delik açmak, delmek.
qûlli biyış L. delinmek.
qûlli kerdış L. delmek, delik açmak.
qûllin rgp. delikli.
qûltî N. yudum.
qûm N. kum.

qûmar N. kumar.
qûmin rgd. kumlu.
qûmpîri N. patates.
qûncik rgp. köşe.
qûndire N. ayakkabı.
qûnek N. n. homo.
qûneki N. m. herkesle yatıp kalkan kadın/kız.
qûnzi N. kaz.
qûrbûn biyış L. kurban olmak.
qûrbûn kerdış L. kurban etmek.
qûrbûni N. m. kurban.
qûrbûni sara birnayış L. kurban kesmek.
qûriqûri rgp. guruldama sesi.
qûriqûri kerdış L. guruldamak.
qûrm N. kütük.
qûrmûcik N. cimcik.
qûrmûciki kerdış L. cimdikleme.
qûrriç biyış L. başını suya daldırıp nefes almadan içmek.
qûrûn N. kuran-i kerim.
qûrwellê N. kuranda bir süre. (kul huwe-llahu ehed)
qûşxûne N. tencere.
qût biyış L. koparılmak, kesilmek.
qût kerdış L. ısırmak, ısırp koparmak.

R

ra nata rgp. ...den beri.
raa rgp. taa (ilerde/ orada)
rado N. radyo.
rafınayış L. sermek.
rakerde rgp. 1. serili.
2. dayalı döşeli.
rakerdış N. 1. sermek. 2. uzatmak.
rakûte rgd. yatan, uyuyan.
rakûtış L. yatmak, uyumak.
ramite rgp. sürülü, sürülmüş.

ramitiş L. sürmek.
rasayî rgd. 1. yetişmiş. 2. olgun, olgunlaşmış.
rasayîş L. 1. varmak, ulaşmak. 2. olgunlaşmak.
rasene N. urgan, ip.
rasnayîş L. ulaştırmak, yetiştirmek.
rast 1. N. doğru, gerçek. 2. rgp. sağ (taraf). 3. dosdoğru, dümdüz.
rast ameyîş L. rastlamak, tesadüf etmek.
rast biyîş L. dogulmak.
rast kerdiş L. 1. düzeltmek. 2. doğrultmak.
rasta rgp. gerçekten, doğru, gerçek.
raste rgp. 1. düzlük, meydan. 2. uzak yer.
rastikiên rgp. sahici, gerçek.
rastî N. doğruluk.
ravistiş L. sermek.
rawrawûn rgp. arasıra, bazen.
razi rgp. razı.
razi biyîş L. razı olmak.
razi kerdiş L. razı etmek.
rehet rgd. rahat.
rehet biyîş L. rahat olmak.
rehet kerdiş L. rahat ettirmek.
rehetî N. rahatlık
rêki rgp. bir defa, bir kez.
remmayîş L. kaçmak.
remnayîş L. kaçırmak.
reng N. renk.
rengîên rgp. n. renkli.
rengîênî rgp. m. renkli.
req û rût rgp. 1. çınl çıplak. 2. kup kuru.
reşesiyayîş L. 1. dans etmek, oynamak. 2. bağırıp çağırmak.
reqinî N. takırtı.
rewiyayîş L. ilmiği kaçmak.
rewnayîş L. ilmiğini kaçırmak.

rê N. 1. yol. 2. çare, çözüm..
rê N. oy, rey.
rê birnayîş L. yol kesmek.
rê diyîş L. çaresini bulmak.
rê eştîş N. oy atmak.
rê kerdiş L. 1. yollamak, göndermek. 2. savuşturmak.
rêdi verdiş L. yolda bırakmak.
rêra mendîş L. yolda kalmak.
rêste N. kirman.
rêyki rgp. bir defa.
rêyna rgp. bir daha, yine.
ri N. yüz.
ri dayîş L. yüz vermek, cesaret vermek.
ri girîotiş L. cesaret almak. yüz bulmak.
ricifiyayîş L. titremek.
ricifnayîş L. titretmek.
ridê ...ra rgp. ... yüzünden.
riki N. 1. kıramp. 2. inat.
rin rgd. iyi.
rin biyîş L. 1. iyileşmek. 2. iyi olmak.
rin kerdiş L. 1. iyileştirmek. 2. iyi yapmak.
rind rgd. n. 1. iyi. 2. güzel. 3. uygun.
rind biyîş L. 1. iyi olmak. 2. iyileşmek.
rind kerdiş L. 1. iyi yapmak. 2. iyileştirmek.
rindi rgd. m. güzel.
rindî N. 1. iyilik. 2. güzellik.
rinkîne rgp. iyice, tamamen.
risîya rgp. yüzsüz, utanmaz, arsız.
riswa rgp. yüzsüz, utanmaz, arsız.
rişiyayîş L. 1. dökülmek. 2. yıkılmak.
rişki N. bit yavrusu, yavşak.
rişkin rgd. n. 1. pasaklı, kirli. 2. bitli.
rişkini rgd. m. 1. pasaklı, kirli. 2. bitli.
rişnayîş L. 1. dökmek. 2. yıkmak.

rişte N. erişte.
riw N. pekmez.
riwênêra rgp. çoktan (beri),
epeydir.
riwî rgp. erken.
riyê e'rdî N. yeryüzü.
riz N. 1. pirinç. 2. pirinç
rî'en N. yağ.
rî'enin rgd. yağlı.
rî'eno kele N. tere yağı.
rîêm N. irin
rîêmîn rgd. n. 1. irinli. 2. mec.
sümüklü.
rîêmîni rgd. n. 1. irinli. 2. mec.
sümüklü.
rîêxi N. 1. gübre. 2. inek dışkısı.
rioc N. 1. güneş. 2. gün.
rioc eştîş L. güneş doğmak.
rioc şiyîş awûn L. (güneş) batmak.
riocce 1. N. oruç. 2. rgd. oruçlu.
riocce girîotîş L. oruç tutmak.
riocce şikîtiş L. oruç bozmak.
riocêki rgp. 1. bir gün.
2. herhangi bir gün.
riokerdîş L. dökmek.
rîoniştîş L. oturmak.
rîoniştîşnayîş L. oturmak.
riote rgp. sat212k
riotîş L. satmak.
roşûn 1. N. bayram. 2. rgd. aydın.
roşûnî N. aydınlık.
rûçikîyayîş L. 1. (tüy) yolunmak.
2. (saç) dökülmek.
rûçikîyayîş L. (tüylerini) yolmak.
rût rgd. 1. çıplak. 2. mec. fakir.

S

sadari N. ince uzun direk, sırık.
salim 1. N. nezle. 2. rgd. nezle
olmuş kişi.
salim biyîş L. nezle olmak.
sapileûnî N. zatürre.

sara N. kafa.* **innê xi sarara di**
bunu başına ört.
sara birnayîş L. kesmek,
boğazlamak.
sara feteliyayîş L. başı dönmek.
sara şe'tîyayîş L. 1. aybaşı olmak.
2. kadının boşanmış olması.
saraher rgp. koca kafalı, salak,
eşşek başlı.
sarûn carûn rgp. nadiren,
arasıra..
sarxoş rgd. sarhos
sawitîş L. sürtmek.
sawûn N. sabun.
sawûn kerdîş L. sabunlamak.
saxî N. (hasta) ziyareti.
sayî N. elma.
saz N. saz.
se rgd. yüz (100).
se rgd. ne. * **Tio va se?** Ne dedin?
se se rgd. yüzer yüzer.
se ker niyêker rgp. ne etti etti
se'eti N. saat.
se'gnayîş L. üstünü yoklamak,
aramak.
se'gneyayîş L. yoklanmak, üstü
aranmak.
seki rgp. gibi. * **seki mi va**
dediğim gibi.
seki ma vaci rgp. örneğin,
diyelim ki.
seki nêva rgp. işte dediği gibi,
dediği gibi, dendiği gibi.
seki vinnê rgp. söylendiği gibi,
dendiği gibi.
seklem N. (bir) çuval (yük).
sekû N. basamak.
semed rgp. sebep, neden.
semed biyîş L. sebep olmak,
neden olmak.
semî N. 1. pay. 2. miras.
semî kerdîş L. 1. paylaşmak.
2. mirası bölüşmek.

semt 1. N. yöre. 2. rgd. yakın(dan).
sepeti N. sepet.
seqet rgd. n. sakat.
seqet biyîş L. sakatlanmak.
seqet kerdiş L. sakatlamak.
seqeti rgd. m. sakat.
seqetî N. sakatlık.
ser rgd. üst, üzeri.
ser kerdiş L. üstüne eklemek, ilave etmek.
ser nayîş L. 1. üstüne eklemek, ilave etmek, katmak. 2. (bir şeyi ocağın) üstüne koymak, pişirmek, kaynatmak.
serbest rgp. n. serbest.
serbest kerdiş L. serbest etmek.
serbest verdiş L. serbest bırakmak.
serbestî rgp. m. serbest.
serbestî N. serbesti, özgürlük.
serd n. 1. rgp. soğuk. 2. N. soğukluk.
serd biyîş L. soğumak.
serd kerdiş L. soğutmak.
serdi rgp. m. soğuk.
serdi vîstîş L. (iddiada) yenmek.
serdi kûtîş L. şaka yapmak.
serdî N. soğuk, soğukluk.
serewde rgp. baş kakıntısı.
serewde kerdiş L. başa kakmak.
serî girîotiş L. üstünü kapatmak, örtmek.
serra rgp. üzerinden, üstünden.
serra zewacyayîş L. (üzerine) kuma getirmek.
serrastî N. (iş güçten sonraki) boş vakit.
serre rgp. yıllık, yaşında.
serri N. yıl.
sersiwê N. sabahleyin.
serûbin rgp. alt üst.
serûbinê xi rgp. altı üstü, hepsi
seserre rgp. yüz yıllık, yüz yaşında.

seserrî N. yüzyıl, asır.
se'tekîar rgd. n. sahtekar.
se'tekîari rgd. m. sahtekar.
se'tekîarî N. sahtekarlık.
sêl N. sel
sêr kerdiş L. seyr etmek.
sicî N. yoğurt suyu.
sida rgp. sürekli, daima, hep.
sîdafi N. düğme.
sie'nd N. yemin.
sie'nd dayîş L. yemin ettirmek, yemin verdirmek.
sie'nd verdiş L. yemin etmek.
sifir rgd. sıfır.
sifte rgp. önce, ilkin.
sifteyên rgp. önceki, ilkin ki, birinci.
sihor N. sahur.
silam N. selam.
silam kerdiş L. selam etmek, selamlamak.
silamî kerdiş L. selam söylemek, selam göndermek.
silamû e'leykûm N. selamun aleykum..
sile N. çöplük, çöp, çöp yığını.
sillek rgd. n. hantal.
silleki rgd. m. hantal.
silli N. 1. tezek. 2. eşek dışkısı.
silqi N. şeker pancarı.
sim N. toynak.
simbêlî N. bıyık.
simer N. saman.
simerin N. samanlı
simîdikîen rgd. kaygan.
sinasayîş L. tanımak.
sinasnayîş L. tanıtmak.
sinifi N. sınıf.
sipî 1. rgd. beyaz. 2. beyazlık.
sipî biyîş L. beyazlaşmak.
sipî kerdiş L. beyazlaştırmak, beyaza boyamak.
sir N. sır.
sirfe N. 1. sofrası. 2. sofrası bezi.

sist rgp. n. gevşek.
sist biyîş L. gevşemek.
sist kerdiş L. gevşetmek.
sistî rgp. m. gevşek.
sistî N. gevşeklik.
siwa 1. N. sabah. 2. rgp. yarın.
siwtarî rgd. soytar², palyaço, yılışık, serseri
siyd N. av.
sîa rgd. kara, siyah.
sîa w qelî rgd. mosmor, morarmış.
sîa w siote 1. rgd. karaya bulanmış olan, işe yaramaz. 2. elinden iş gelmeyen kimse. 3. esmerleşmiş, bronzlaşmış.
sîê rgp. gibi.
sîêm N. gümüş.
sîêmin rgd. gümüş, gümüşten..
sîêmea N. 1. alıç. 2. alıç ağacı.
sîêne N. göğüs, sine.
sînayî rgd. sevimli.
sînayîş L. sevmek.
sîngî N. mantar.
sîkke N. (demir) sikke, kazık.
sîkûr N. n. yetim.
sîkûri N. m. yetim.
sîoki rgp. 1. nasıl ki, gibi, sanki, adeta. 2. eğer.
sîpeki N. sapa.
sîr N. sarımsak.
sîrkuik N. (havan) tokmağı.
soba N. soba.
solî N. tuz.
solî kerdiş L. tuzlamak.
solin rgd. tuzlu.
sûki N. şehir.
sûkieî rgd. şehirlî.
sûndixi N. sandık.
sûnnet N. sünnet.
sûnnet biyîş L. sünnet olmak.
sûnnet kerdiş L. sünnet etmek.
sûnnetkerde rgd. sünnetli.
sur rgd. 1. kırmızı. 2. (sıcak) kızgın.

sur biyîş L. kızarmak.
sur kerdiş L. kızartmak.
surekî N. kızamık.
sûsa N. karayolu.

Ş

şa rgd. mutlu, sevinçli.
şa kerdiş L. mutlu etmek, sevin-dirmek.
şa biyîş L. mutlu olmak, sevinmek.
şalûndî N. uçkur.
şamê xi kerdiş N. akşam yemeği yemek.
şamî N. akşam yemeği.
şakîl N. gazel, ağaç yaprağı.
şar N. 1. halk, el. 2. yabancı.
şarm rgp. utanç, utanma.
şarmîyayîş L. utanmak.
şarmnayîş L. utandırmak.
şaş N. yanlış, eğri.
şaş rgd. şaşî.
şaş biyîş L. şaşırmak.
şaş kerdiş L. şaşırtmak, yanıltmak.
şaş mendîş L. şaşırmak.
şatiki N. ense.
şawitîş L. göndermek.
şawiyayîş L. gönderilmek.
şer'd N. n. şahit.
şer'di N. m. şahit.
şer'di N. şahitlik.
şer'di kerdiş L. şahitlik etmek.
şeker N. şeker.
şekerin rgd. şekerli, tatlı.
şelleqiyayîş L. (apış arası) kızarmak.
Şe'merûn N. Şahmaran.
şemşî N. şemşiye.
şenik rgd. hafif.
şenik biyîş L. hafiflemek.
şenik kerdiş L. hafifletmek.
şenikî N. hafiflik.

şeq N. bacak.
şeqetiyayî rgd. yerinden çıkmış, kopuk.
şeqetiyayîş L. yerinden çıkmak, kopmak.
şeqetnayîş L. yerinden çıkarmak, koparmak.
şer N. şer, kötülük.
şerbet N. şerbet.
şerûd rgd. kavgacı.
şeş rgd. altı.
şeş şeş rgd. altışar.
şeseşki N. ramzandan sonraki altı günlük oruç.
şeşin rgd. altıncı.
şeşini rgd. altı tane, altı taneyi.
şeşrêse rgd. altıyüz.
şeştî rgd. altmış
şe'tiyayî rgd. bozulmuş, dağıtılmış.
şe'tiyayîş L. bozulmak.
şexşiki N. kırık çömlek parçaları (ve bir topla oynanan oyun).
şextûn N. lastik, kavucuk gibi olan şey.
şehîd N. n. şehid.
şehîdi N. m. şehid.
şehîdi N. şehidlik.
şên rgp. şen. * **Ocaşê tîo şên bo!** Ocağın şen olsun!
şênik N. kalabalık, millet, insanlar.
şêx N. şeyh.
şikitiş L. kırmak.
şikiti rgd. kırık.
şikiyayîş L. kırılmak.
şiknayîş L. kırmak.
şillaf rgd. şireli, pis.
şilli rgp. (yağmurdan sonraki) ıslaklık ve çamurluk hali.
şilli w şapallî N. (çamurlu ve) yağmurlu hava.
şima rgd. 1. siz. 2. sizin.
şimitiş L. emmek, sormak.
şipik N. terlik.
şirri N. şırlıtı.

şit N. süt.
şit dayîş L. süt vermek, hayvanın sağlıyor olması.
şite rgd. yıkanmış.
şitûn rgd. sütlü.
şitiş L. yıkamak.
şitra birnayîş L. (çocuğu) süttten kesmek.
şîn N. yas.
şîn kerdîş L. yas tutmak, ağlamak.
şiriki N. kuma.
şirîn rgd. n. tatlı, şirin.
şirini rgd. m. tatlı, şirin.
şirkûtik N. (havan) tokmagı.
şirşeyîş L. zonklamak.
şitûn N. şeytan.
şitûni N. şeytanlık, hilebazlık.
şiwî N. m. gece.
şiwêna rgp. 1. başka bir gece. 2. bir gece daha.
şiwra rgp. sabah erkenden, geceden.
şiwrioc rgp. devamlı, gece gündüz.
şiwşiwiki N. yarasa.
şiyîş L. gitmek.
şoqî N. dibek.
şûkrê xi ardiş L. şükretmek.
şûn N. akşam.
şûnayîş L. sallamak.
şûndi rgp. geceleyin.
şûndixi N. sandık.
1 şûne N. tarak.
2 şûne N. çoban.
şûne kerdîş L. taramak.
şûniki N. masal.
şûnra şûn rgp. akşamdan akşama, akşamları.
şûrti N. (yaş ağaçtan) sopa, değnek.
şûş biyîş L. (ayağı) kaymak.
şûş kerdîş L. kaymak.
şûşa N. şişe.

DU KITÊBÊN NÛ JI BO ZAROKAN


Her du kitêb jî bi resmên rengîn, jî bo zarokan hatine amedekirin. Kitêb jî aliyê weşanxana Apecê ve hatine weşandin. Hûn dikarin van kitêbana li navnîşanên jêr peyda bikin:

HOSTE MEMO

otomobilekê çêdike

Hoste Memo makîne, xurde û alavan berhev dike.

Rojekê biryara xwe dide ku jî van tiştên kevnûkot otomobilekê çêbike. Gelo hertiştên ku jê re lazim in hene? Û ew ê çawa saz bike?



Manga Sor pagijiyê dike

Manga Sor got:

-Ka binêre, min çî kiriye! Min gul berhevkin, toza li ser pencerê hilda. Her Mangeyek vî karî nake.

Qiriko got: Karê çî?

Mangê got: Paqijî.

Qiriko kir qireqir û got: Paqijî!? De here lê... tu û paqijiya te! *Tu jî dê min bixapîni!* Te boça xwe hinek li ba kir û tu jî vê re jî dibêjî, paqijî!?

Li Almanyayê:

M. Özgür/Bîrmebûn

Postfach 900348, 51113 KÖLN/Almanya

Telefaks: 0049-(0)2203-301630


li Swêdê:

Box: 3318, SE 163 03 Spånga / Sverige

Telefon: 0046-(0)8-761 81 18

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-Mail: apec@swipnet.se



"birnebün" e di bi computer dardikêne

Bawo!
TE Computer a ma
kajer bingc